Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1300 | 3-Îlon-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | rojnameyaronahi | @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com | Rojnameya Ronahî | +963 984 370 218

# Li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê 3 cihên şûnwariyê...(8)

**Navenda Nûçeyan**

**Li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi dehan cihên dîrokî ku dîroka wan vedigere hezarên salan, hene. Her cihek xwedî şarestanî, nirx, çand û dîrokeke. Ji van cihên şûnwariyê gundê Lêlên, Til Meşneqe û Mizgefta Mensûr e.**

**Gundê Lêlên**

Gundê Lêlên bi 8 km dikeve bakurê navçeya Tirbespiyê. Gund bi girê xwe yê dîrokî navdar e. Şûnwarên gir heta niha mane. Derdora 150 sal berê gund li rex girê dîrokî hatiye avakirin. Li gorî lêkolînên dîrokî ku behsa gundê Lêlên dikin, diyar dikin ku di wê demê de bajarek bû û navê wî Şexna bû. Di salên di navbera 2300`an heta 2200'an B.Z. de di bin serweriya Împarotariya Akadan de bû ku gelek navendên Akadî li herêma Xabûr ava kiribûn. Ji delîlên ku hebûna Akadan li vê herêmê îsbat dike, hatine vedîtin. Akadiyan bajarê nizm bi sûreke parastinê gelek mezin bi qalinbûna 8 metreyan ava kirin. Di dema Akadiyan de bajar ji aliyê çandiniyê û aboriyê ve geş bûbû. Akadiyan gelek avahiyên giştî wekî perestgeh ava kirin û ayînên baweriya Akadiyan lê pêk dianîn. Şandeya Amerîkayê ya ji Zanîngeha Yale bi rêveberiya Harvî Ways di sala 1979'an de ku li gir vekolîn kirine, hate diyarkirin ku dîroka gir vedigere serdema Hamûrrabî. Şandeya Amerîkayê di nivîsandina raporên xwe de ruqmên mixî û peykerên axî ku di vekolînan de dîtine, bingeh girtin. Xebatên vekolînê heta destpêka aloziya Sûriyê sala 2011'an berdewam kiribûn. Gundê Lêlên ji girîngtirîn cihên stratejîk ên serdemên kevn e. Her wiha di wê demê de cihekî bazirganiyê yê girîng bû û tê de depoyên genim hebûn. Şêniyên wê bi pirranî bazirganî dikirin. Heta niha jî şûnwarên depoyên genim lê hene.undê Lêlên bi 8 km dikeve bakurê navçeya Tirbespiyê. Gund bi girê xwe yê dîrokî navdar e. Şûnwarên gir heta niha mane. Derdora 150 sal berê gund li rex girê dîrokî hatiye avakirin. Li gorî lêkolînên dîrokî ku behsa gundê Lêlên dikin, diyar dikin ku di wê demê de bajarek bû û navê wî Şexna bû. Di salên di navbera 2300`an heta 2200'an berî zayînê de di bin serweriya Împarotariya Akadan de bû ku gelek navendên Akadî li herêma Xabûr ava kiribûn. Ji delîlên ku hebûna Akadan li vê herêmê îsbat dike, hatine vedîtin. Akadiyan bajarê nizm bi sûreke parastinê gelek mezin bi qalinbûna 8 metreyan ava kirin. Di dema Akadiyan de bajar ji aliyê çandiniyê û aboriyê ve geş bûbû. Akadiyan gelek avahiyên giştî wekî perestgeh ava kirin û ayînên baweriya Akadiyan lê pêk dianîn.

Li gorî şandeya Amerîkayê ya ji Zanîngeha Yale bi rêveberiya Harvî Ways di sala 1979'an de ku li gir vekolîn kirine, hate diyarkirin ku dîroka gir vedigere serdema Hamûrrabî. Şandeya Amerîkayê di nivîsandina raporên xwe de ruqmên mixî û peykerên axî ku di vekolînan de dîtine, bingeh girtin. Xebatên vekolînê heta destpêka aloziya Sûriyê sala 2011'an berdewam kiribûn. Şandeyê di raporên xwe yên ku radestî hikumeta Sûriyê kiribûn de diyar kiribûn ku girê gundê Lêlên ji girîngtirîn cihên stratejîk ên serdemên kevn e. Herwiha di wê demê de cihekî bazirganiyê yê girîng bû û tê de depoyên genim hebûn. Şêniyên wê bi pirranî bazirganî dikirin. Heta niha jî şûnwarên depoyên genim lê hene.




**Til Meşneqe**

Til Meşneqe li herêma Cizîrê li nêzî çemê Xabûr dikeve, ew yek ji cihên dîrokî yên girîng ên Mezopotamyayê ye. Ev cih bi gelemperî şarestaniyên kevn ên Mezopotamyayê ên di sedsalên 3 heya 4'an ên berî zayînê de dijiyan, diteyisîne. Lêkolînên arkeolojîk di nav salên 1980 û 1990'î de hatine kirin û gelek şûnwarên kevn wekî kûzên rengîn, muhr û neqşeyên dîrokî hatine dîtin. Di nav wan de, peykerên biçûk û serê lawiran hatine vedîtin, ew şûnwar jî reng û rêbazê civakên li wir jiyana xwe bi rêveberiya civakî û çandî pêk tanîn nîşan dide. Til Meşneqe cihekî xwedî taybetmendiyeke girînge di warê pêkanîna lêkolînên dîrokî de, ji ber ku ev cih nîşan dide ka çawa kûz, nivîs û şûnwarên kevin di Mezopotamyayê de hatine çêkirin û pêşxistin. Herwiha Til Meşneqe cihê stratejîk û bazirganiyê riyên kevin ên gelên Mezopotamyayê ya nîşan dide.

**Mizgefta Mensûr**

Jê re Mizgefta Mensûr an Mizgefta Ebbasiyan jî tê gotin. Ev mizgeft li navenda bajarê Reqqayê yê îroyîn e. Girîngiya wê, tevî rewşa wê ya xirab a îroyîn, di wê rastiyê de ye ku ew yekane mînaka şêwaza fermî ya mizgeftên serdema Ebbasiyan li Sûriyê temsîl dike. Ev şêwaz bi girseyîbûna xwe û bi rastî jî ku rûyên wê yên derve ji hêla girseyîbûna xwe û bircên ku di nav wan de çar burc hene, şiklê kelehan digire, tê xuyakirin. Li gel bermahiyên koşkên Ebasiyan û bermahiyên dîwarê derve û deriyên wê avahiyên arkeolojîk li Parêzgeha Reqayê yên herî girîng in.

## Gotina Dawî



### Çima QSD bi şamê re li hev nake?

Mihemed Seydi

Dewleta Tirk ji destpêka aloziya li Sûriyê, derdê wê ew e ku li Rojava Kurdan qir bike. Lê ji ber nedibû ku rasterast êriş bike, Cebhet El-Nusra ku paşê navê wê kirin HTŞ'ê xist tevgerê û berê wê da Serê Kaniyê. Êrişa destpêkê 2012'an bû. Paşê komên din li hember Kobanê sor kirin ku ji xwe re digotin artêşa Azad, lê nekarîn encamekê bi dest bixin. Piştre DAIŞ derket û hemû komên din bi fermana dewleta Tirk hatin daqurtandin û bûn beşek ji DAIŞ. Vê carê bi navê îslamê û DAIŞ'ê êrişî Kurdan kirin ta 2014'an ku serokê AKP'ê Erdogan got Kobanê ket ha dikeve. Lê Kobanê neket û tevgera Kurdan hêdî hêdî mezintir bû. Ereb û Aşûrî û Ermen jî tev li vê hêzê bûn heta ku Bakur û Rojhilatê Sûriyê tev ji destê DAIŞ hat derxistin û rêveberiya wê ya giştî hat avakirin. Hemwextî ku QSD'ê Şerê terorê li çolên Dêrazor û Reqayê dikir, Ebû Mohammed El-Colanî hemû endamên xwe ku ew jî beşek ji projeya El-Qaide ya li Sûryê bû, komî Idlibê kirin û bi tu aliyan re nema kete nava şer. Lê bi desteka dewleta Tirk û li aliyê din di bin serpereştiya Rêxistinên Britanî û Emrîkî de dihat destek kirin.

Di 8'ê Kanûna 2024'an de, hat ragihandin ku HTŞ'ê operasyon li dijî rêjîmê da destpêkirin û di nava çend rojan de Heleb hat kontrolkirin. Bêyî ku şerekî berçav çêbibe, hêza rêjîmê hemû belav bû, saziyên istîxbaratê hilweşiyan û Beşar El-Esed reviya. Lê ji bilî Israîl, kî li pişt hilweşîna rêjîmê bû?

Ji ber pisporên Ukran endamên HTŞ li ser balafirên Deron perwerde kiribûn, hat gotin ku hêzên Rojava û bi taybet Britaniya xwestiye derbekê li Rûsiya bixe, lewma hevalbendê wê Esed hilweşand. Ji ber şer li dijî Rûsiya bû jî, Ukran beşdar bûn. Kî li pişt be û çawa plan hatibe kirin meseleyeke, lê meseleya esasî ew e ku komên beşek ji El-Qaide ne anîn li koşka serokatiya Sûriyê danîn.

Ev terora ku navê wê û rengê wê guhertin, dixwazin bi gelê Sûriyê bidin qebûlkirin, lê piştî komkujiyên ku çêbûn, kes baweriyê nade.

Li aliyê din, Ebû Mohamed E-Colanî ku niha bi Ehmed El-Şeri tê bi navkirin, dibêje ku yê dixwaze desthilat be, divê tawîzan bide. Bi vê siyasetê dixwaze hemû aliyên navdewletî li ser hesabê gelê Sûriyê razî bike. Lewma niha gefan li Kurdan jî dixwe. Di dema nivîsandina vê gotarê de, nûçe belav bûn ku Ehmed El-Şeri ji rojnameyeke Tirka re gotiye; "ger QSD'ê teslîm nebe, ew ê Tirk êriş bikin. QSD'ê peymana Adarê pêk nayîne." û hwd. Lê ev daxuyaniya EL-Şeri di demekê de ye ku nûnerê wî yê karê derve Eseid El-Şêbanî li Waşintonê ye. Ji ber berpirsên DYA îşaret bi peymana 10'ê Adarê ya di navbera Şam û QSD'ê de kirin, El-Şeri dixwaze bibêje ku ne ew in ku peymanê pêk nayînin û aliyê din sedeme. Lê li ber çave ku reşnivîsa destûrî ya Hikumeta El-Şeri li ser dimeşe, destûra DAIŞ'e û bi peymana bi QSD'ê re dijbere. Ji ber QSD'ê li dijî terorê şer dike, ew ê bi mêjiyê DAIŞ ku li Şamê ne re nikaribe li hev bike.

**Sudoku:Pirs 58**

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 3 | | | 7 | 2 | | | 5 |
| | 2 | | | | | 3 | | 6 |
| | | | 4 | | 3 | 2 | | |
| 8 | | 9 | | | 7 | | | 3 |
| | | | 8 | 3 | 1 | | | |
| 1 | | | 2 | | | 5 | | 7 |
| | | 4 | 7 | | 8 | | | |
| 7 | | 5 | | | | | 1 | |
| 6 | | | 9 | 8 | | | 3 | |

**Sudoku: Bersiv 57**

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 4 | 9 | 2 | 7 | 3 | 5 | 6 | 8 | 1 |
| 7 | 8 | 1 | 6 | 2 | 9 | 4 | 5 | 3 |
| 5 | 3 | 6 | 1 | 4 | 8 | 9 | 2 | 7 |
| 1 | 5 | 3 | 2 | 7 | 4 | 8 | 9 | 6 |
| 6 | 7 | 9 | 5 | 8 | 1 | 2 | 3 | 4 |
| 8 | 2 | 4 | 3 | 9 | 6 | 1 | 7 | 5 |
| 2 | 4 | 5 | 9 | 6 | 3 | 7 | 1 | 8 |
| 3 | 6 | 7 | 8 | 1 | 2 | 5 | 4 | 9 |
| 9 | 1 | 8 | 4 | 5 | 7 | 3 | 6 | 2 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Kî zava be ew şoşman e:**
- Kî karekî dike ew jî xwe di ber re dike; karê wî be ne karê wî be xwe tevlî her tiştî dike.

**Kî zava ye ew birazava ye:**
- Bi heman wateyê.

**Nanê xwe avêt nava helawê:**
- Ew jî tevlî gengeşeyê bû.

**Tiliya xwe/bêvila xwe dixe her qulê:**
- Tevlî karê her kesî dibe; karê wî be ne karî wî be tevlî dibe.

**Tu kîjan kevirî rakî ew ji bin derdikeve.**
- Destê wî di nava her tiştî de heye; tevlî her tiştî dibe.

**Dewla me av negirt:**
- Karê me bi ser neket, em ngihatin armanca xwe, tişta me dixwest pêk nehat.

**Dewla me neket avê:**
- Bi heman wateyê.

**Dewla wî avê nagire:**
- Bi heman wateyê.

**Germikan nede ber dilê xwe:**
- Dilê xwe xweş neke, tişta ku tu dixwazî bi destê te nakeve.

**Hê dewla wî av negirtiye:**
- Hê daxwaziya wî pêk nehatiye.

**Hêviya wî şkest:**
- Tiştên di serê xwe de digerandin pêk nehatin.

**Ji hindik heta bigihe gundik:**
- Daxwaziyên mirov hemû bi hev re pêk nayên.

**Ker çû da du stirhan ji xwe re bîne, her du guhên xwe jî li ser danîn:**
- Çû da tiştekî ji xwe re bîne, tişta heyî jî ji dest derket.

**Keyfa me bi Xunavê xweş bû, Xunavê jî kurekî mirî anî:**
- Xweziya me di qirika me de ma; hêviya me şkest; em negihatin xwesteka xwe.

**Li bêhna kebabê çû bi ser daxdana keran ve bû:**
- Bi çi niyetê çû bi ser çi ve bû; bi hêviya tiştekî baş çû lê rastî tiştekî nebaş hat.

**Lingê wî sefik negirt:**
- Bi ser neket; negihat armanca xwe.

**Me bûk anî lezobezo sivika malê bûm ez:**
- Tişta me hêvî dikir pêk nehat; weke daxwaziya me çênebû; em xusirîn.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî




### 'PYD`ê bû nûnera pêkhateyên herêmê'

Hevseroka PYD`ê Perwîn Yûsif diyar kir ku PYD`ê di bingeha xwe de rêxistinbûyîna xwe ji rêxistinbûyîna gel digre û wiha got: "PYD`ê karîbû hemû pêkhateyan li derdora xwe kom bike û bibe cihê çareseriyê.**R-4**

### 'Azadiya Rêber Apo daxwaza tevahî gelên herêmê ye'

Serokê eşîreya Al-Ikêdat a Erebî Ebdelmunim Elxatir diyar kir ku kampaniya 'Ez dixwazim bi Rêber Apo re hevdîtinê bikim' têkiliya kûr a di navbera Rêber Apo û gelên herêmê de nîşan dide û wiha got: "Vê kampaniyê ji cîhanê re da xuyakirin ku daxwaza azadiyê Rêber Apo ne daxwazeke partiyekê an gelekî ye, lê ew daxawaza tevahî gelên herêmê ye.".**R-3**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1309 | 21-Îlon-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S




### 'Bêt Nehrên ji bo bidestxistina mafê jinên Suryanî hate damezirandin'

Nûnera Hêzên Parastina jinan Bêt Nehrên Nûr Suryan destnîşan kir ku yek ji sedemên damezirandina van hêzan ew e ku mafên wekhev ji bo jinên Suryanî li Sûriyê misoger bikin û li hember sînordarkirinên ku ji hêla kesayetên olî yên herêmê ve li ser jinan û çalakiyên femînîst têne danîn, li ber xwe didin."**R-2**

# SEYÎD EVRAN ÇIRAYA HEQÎQETÊ YE RIYA ROJNAMEVANAN RONÎ DIKE

Şehîd Seyîd Evran ji çiyayên azad heta Bakur, ji Başûr heta Rojhilat û Rojavayê Kurdistanê, gav bi gav bi gelê xwe re li pey şopa heqîqetê bû. Wî jiyana xwe xiste xizmeta doza gelê xwe û gelên herêmê, di dîroka gelê Kurd de rêwîtiyeke têr û tijî têkoşîn hişt. Seyîd Evran nifşekî zane ji rojnamevanên şoreşger ava kir û bû çiraya heqîqetê. **R-5**





### Ji çiraxên hunera Kurdî

Hunermend Xalid Cûdî ne tenê wekî stranbêjekî, lê wekî şahidê êşa ku hunera xwe bi tevahî dixe xizmeta folklor, ziman û bîra civakê de. Bi hunera xwe ya resen pirekî di nav mîrate û xewnê de xêz dike û strana Kurdî dike belgeyek zindî ji bo hebûn û pêdariyê. **R-7**



Şoreşa Rojava û berpirsyariya wêjeyê
Remezan Olçen *R-7*



Şevreşa herî tarî ya berî şifeqê ye!
Ahmet Aktaş *R-4*



Seyid Evran.. Pênûsa qet naşike û romana heqîqeta bê dawî
Zekî Bedran *R-5*



### 'Deriyê aramî û ewlebûna Sûriyê bi vegera koçberan vedibe'

Parêzer û Berpirsê Ofîsa Têkiliyan a Komîteya Koçberên Serêkaniyê Ciwan Îso diyar kir ku dagirkerî herêmên dagirkirî kiriye cihê binpêkirina mafê mirovan û got, "Divê destpêkê pirsgirêkên di hundirê Sûriyê de bên çareserkirin, bi taybet mijara koçberan, ji ber heya yek koçber di kampan de be, aramiya Sûriyê pêk nayê. **R-6**

# ‘Bêt Nehrên ji bo bidestxistina mafê jinên Suryanî hate damezirandin’

Nûnera Hêzên Parastina jinan Bêt Nehrên Nûr Suryan destnîşan kir ku yek ji sedemên damezirandina van hêzan ew e ku mafên wekhev ji bo jinên Suryanî li Sûriyê misoger bikin û li hember sînordarkirinên ku ji hêla kesayetên olî yên herêmê ve li ser jinan û çalakiyên femînîst têne danîn, li ber xwe didin.

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**



Hêzên Parastina Jinan ên Bêt Nehrên di 30'ê Tebaxa 2015'an de li bajarê Tirbespiyê yê kantona Cizîrê wekî baskê leşkerî yê tevgera siyasî ya Suryanî, di bin siya Hêzên Sûriyeya Demokratîk (QSD) de hat avakirin û tê de jinên Suryan ên ji kantonê cih girt, ew hate damezrandin da ku bibe bersivek pratîkî li hember êrişên hovane yên çeteyên DAIŞ'ê.

Derbarê kar û xebatê Hezên Parastina Jinan Bêt Nehrên Nûnera Hêzên Parastina Jinan Bêt Nehrên Nûr Suryan ji Rojnameya me re axivî.

**‘Hebûna jinan ne tenê bi aliyê sembolîk ve sînordar bû, lê di demek kurt de beşdarî eniyên şer bûn’**

Nûnera Hêzên Parastina jinan Bêtnehrên Nûr Siryan anî ziman ku Damezrandina van hêzan bi yek ji qonaxên herî dijwar ên ku gelê Suryanî jiyan kiriye re hevdem bû û wiha got: "Dema ku çeteyên terorîst ên DAIŞ'ê êrîşî gundên hewza Xabûr kirin, kuştin, revandin û koçberkirina niştecihan kirin, dîmen di wê qonaxê de trajîk bû, mêr di nav Encûmena Leşkerî ya Suryanî û hêzên Sotoro (Ewlekariya Navxweyî ya Suryanî) de şer dikirin, di heman demê de jin bi du bijarteyan re rû bi rû man, an wekî qurbaniyên potansiyel li kêlekê bisekinin, an jî bi awayekî çalak beşdarî parastinê bibin. Jinê gelê me êdî nikaribûn temaşevanên rastiyê bin. Ew dixwestin bibin şirîkên rastîn di parastina ax û welat de. Ji ber vê yekê fikra damezrandina Hêzên Parastina Jinan ên Bêt Nehrên derket holê. Hebûna jinan ne tenê bi aliyê sembolîk ve sînordar bû, lê di demek kurt de beşdarî eniyên şer bûn. Hêzên Parastina Jinan ên Bêt Nehrên li kêleka hêzên din li dijî DAIŞ'ê û rêxistinên tundrew şer kirin. Di nav wan de şerên Şedadê, Holê û Reqayê, her wiha kampanyayên leşkerî yên din ên ku di şikandina terorîzmê de li herêmê biryardar bûn, hebûn. Ev beşdarbûn ne tenê hebûneke fermî bû, lê jinan jêhatîbûna xwe di şer de û şiyana xwe ya beşdarbûna li kêleka mêran di çalakiyên leşkerî yên rêxistinkirî de nîşan dan."

**‘Şert û mercan jinan neçar kir ku rasterast di parastinê de bibin aliyekî’**

Nûr Suryan destnîşan kir ku Ji faktorên herî girîng ên ku jinan ber bi hilgirtina çekan ve birine, yên herî berbiçav sûcên hovane yên ku ji hêla DAIŞ'ê û rêxistinên terorîst ve li dijî gelê Suryanî hatine kirin û wiha got: "Çi ji kuştin, tecawiz, revandin û wêrankirina gundan, jinên Suryanî fêmkirin ku parastin êdî ne ji mêran tenê tê xwestin,ji ber vê jî şert û mercan wan neçar kir ku rasterast di parastinê de bibin aliyekî. Karê hêzên me tenê bi hilgirtina çekan ve sînordar nebû, aliyekî din ê bi qasî vê girîng hişyarkirina jinan e. Semîner û gotar li ser girîngiya parastina xwe û rola jinan di jiyana leşkerî de têne lidarxistin. Armanc ew e ku di meqamên leşkerî de hevsengiyek di navbera jin û mêran de were afirandin û ew raman were pêşxistin ku hebûna jinan di meydanê de pêdiviyek e."

**‘Em rastî astengiyên civakî û çandî hatin’**

Nûnera Hêzên Parastina jinan Bêt nehrên Nûr Siryan bal kişand li ser astengiyên derketin pêş wan û got: "Ji damezrandina xwe ve, ev hêz rastî astengiyên civakî û çandî hatine, bi taybetî jî nêrîna kevneşopî ya li ser rolên jinan, ku wan kêm dike tenê jin, dayik, an pîşeyên sivîl ên wekî bijîşkî û perwerdehiyê dibînin. Ketina jinan di nav artêşê ezmûneke nû û dijwar bû, nemaze di warê hevsengkirina jiyana civakî û leşkerî de. Ji bo mêran mijar hêsantir e, ji ber ku ew ji temenê biçûk ve bi fikra xebata leşkerî ve asê mane. Ji bo jinan ev ezmûnek nû bû, lê me îspat kir ku îradeya me ji zehmetiyan xurttir e. Jin êdî di civakê de ne tenê qurbanî ne û rola wan êdî ne tenê bi bîranîna dîrok an şaristaniya wan ve sînordar e, lê belê ew di dema niha de bûye hêzek çalak. Jinên gelê me êdî ne tenê sembolek dîrokî an mîrateyek çandî ne. Îro, ew bûne hêzek rastîn a parastina jiyan û rûmetê. Em soz didin ku Hêzên Parastina Jinan ên Bêt Nehrên dê sembola biryardarî, hêz û azadiyê bimînin. Ezmûna jinên Bêt Nehrên peyamek gerdûnî hildigire, ku jin şirîkên azadî û wekheviyê ne û hebûna wan di warê parastinê de êdî ne vebijarkek e, lê belê pêdivîyek e. Têkoşîn dê berdewam bike heta ku her jin cihê xwe yê xwezayî di dewlet û civakê de bi dest bixe."



Nûr Suriyan di dawiya axaftina xwe de bang li hemû jinan kir û got: "Bêyî ku cudahiya wan a neteweyî an olî hebe, ku tevlî refên Hêzên Parastina Jinan ên Bêt Nehrên bibin. Cihê te di nav me de ye, çi Kurd, Ereb, çi Suryanî be. Em bang li her jinê dikin ku tevlî me bibe û bibe şirîk di parastina gelê me, welatê me û axa me de."

# Dayîka Edla yek ji jinên Kurd yê bi hêz e

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

**Dayîka Edla dayîkeke Kobanî ye ku beriya Şoreşa Rojava di nava kar û xebatê de ye, di dema Rêjîma Baas'ê bi awayekî veşartî civîn lidardixistin û guhdarî axaftian Rêber Apo dikirin. Herwiha cihê xwe di şerê Kobanê û Bendava Tişrînê de jî girtiye û di şerê Efrînê de daket Efrînê da ku piştgiriya gelê Efrînê bike.**



Dayîka Edila sembola jina Kurd a bi hêz e. Ew yek ji hezarên dayîkên kurd e, ku jiyana xwe bi ked, kar û xebatê ji bo Rêxistinê û tevgerê azadiyê qedandiy e. Di demeke hesas de ku deng, reng û mafê kurdan nedihat qebûlkirin, ew jinên Kurd yên bi hêz kar dikirin û nehêştin ku ziman û hebûna gelê Kurd winda bibe. Hemû jinên kurd bi Rêber Apo, gêrîlayên jin û PKK'ê bandor dibûn, ji ber vê yekê her roj israra wan ji bo azadiyê û têkoşînê mezintir dibû.

**‘Ji beriya Şoreşa Rojava de di nava kar û xebatê de ye’**

Dayîka Edila ew di malbetek Şehîdan, gerîla û welatparêz de mezin bûye. Ji berî şoreşa rojava de ew di nava kar û xebatê deye, lê ji ber desthilatdarî û zordariya Rêjîma Baas'ê wê bi dizî û bi awayekî veşartî kar û xebatê rêxistinê dikir. Bi awayekî veşartî hemû gelên welatparêz li malekê diciviyan û sîdiyên ku deng û vîdoyên Rêber Apo temaşe û guhgar dikirin herwiha dîsa bi awayekî veşartî civînên xwe lidardixistin. Dema ku ev gel guhdarî axaftina Rêbertî dikirin gelek pê bandor dibûn û yek ji van kesên ku gelek ji Rêber Apo bandorbûne dayîka Edila bû, ku jiyana xwe di nava kar û xebatê de derbas kiriye.

Ji biçûkaniya xwe de dayîka Edila karê paletiyê dikir ji bo ku alîkariyê ji Rêxistinê û tevgerê re bişînin. Meh bi meh wan alîkarî ji dostên tevgerê komdikir û ji tevgerê re, rêdikir.

Dayîka Edila dibêje: "Ez pir bi şansim ku min di nava Rêxistin û partiyê de kar kir. Min rêya tevgerê azadiyê û Rêxistinê, fikir û felsefeya Rêber Apo hilbijart û ez tê de meşiyam. Min dest ji tevahî rêyan berda, û min ev rê kir armanca xwe ji ber ku ez gelek pê bandor bûm û keda ku Rêber Apo, gerîla û PKK ji bo me daye bandor bûm û ez xwedî li keda wan derketim û li ser riya wan meşiyam. Rêber Apo gelê Kurd ji mirinî rizgar kir û çavê wan li jiyanê vekir, dijminên kurdan gelekin û yên ku dixwazin zimanê kurdî tune bikin jî gelekin Rêber Apo bi fikir û felsefeya xwe ev guhart herwiha gelê Kurd jî kir xwedê hêz."

**‘Dayîka Edla di şerê Kobanê, Efrînê û Bendava Tişrinê de cihê xwe girtiye’**

Dayîka Edila di şerê Kobanê de cihê xwe digirt, li kêleka YPJ'ê û YPG'ê zêdetirî 4 mehan li berxweda. Di dema şer de dayîka Edila xwarin ji şervanan re amade dikir, cilên wan dişûştin û kêlî bi kêlî li kêleka, YPJ'ê YPG'ê û birîndaran disekinîn. Di şerê kobanê de dema ku herêm vala bû dayîka Edila û 4 kes tenê li Kobanê man û ew li kêleka şervanên xwe sekinîn.

Dayîka Edile di 2018'an di dema şerê Efrînê de ji bo piştgiriya gelê Efrînê bike, daket bajerê Efrînê, dayîka Edila 15 rojan bi gelê Efrînê re li berxweda. Di rê de dayîka Edila rastî gelek zehmetiyan hat, lê tu carî dest ji têkoşîn û berxwedaniya xwe berneda. Dayîka Edila cihê xwe mewziyên şer yên Efrînê de girt.

**‘Di berxwedaniya Bendava Tişrîne de pêşeng bû’**

Dayîka Edila di şerê Bandava Tişrînê de cihê xwe di berxwedaniyê de digirt. Dayîka Edil berî ku derbasî Bandavê bibe wê xatira mirinê xwast, dema ku dayîka Edila derbasî bendavê bû hêrs û nefretê xwe li hemberî dewleta Tirk zêdetir dibû herwiha hêz, bawerî û berxwedaniya wê ji bo şehîdan, gel û welat zêde dibû. kêliyên ku Dewleta Tirk li bendava Tişrînê bi awayek bi bandor bombebaran dikir dayka Edila jî di topbarana dewleta Tirk de birîndar dibe, ruxmê birîndariya xwe jî dibêje "Em ji mirinê mezintirin" tevî hemû zor û zehmetiyan wê dest ji têkoşîn û berxwedaniyê berneda. Dema ku ew diçûn bendavê 5 km meşiyan bafirên keşifê û şer li ser serê wan re diçû herwiha derdora wan dihat bombebaran kirin, lê tu carî dayêka Edila gav paşde neavêt û dest ji têkoşîna xwe berneda. Li ser Bendava Tişrînê dayîka Edila birîndar bû, dîsa jî wê dest ji berxwedaniyê berneda û têkoşîna xwe berdewam kir. Dema ew birîndar bû ji tu kesî derdoya xwe re negot, ji bo ku bandor li ser gel nebe, wê birîna xwe bi xwe bi paçekê aland û got: "Bila ev bîrîn bibe qurban ji şehîdan re, ji hevalên ku cihê xwe bi şev roj di çeperên şer de digirin be."

Dayîka kurd Edila got: "Em çiqas kar û xebat bikin, kedê bikin em deyndarê Şehîdan û Rêber Apo ne."

Dayîka Edila sembola jina kurd a azad e. Ev dayîka bi hêz, îrade û tekoşîna jinê nîşanda. Jinek azad, berxwedêr yê ku serê xwe ji kesî re ratewîne ye.



# Ji çiraxên hunera Kurdî

**Can Yûsif**

Hunermend Xalid Cûdî Sembola dilsoziya kultûr û çanda kurdî. Di demeka ku siyasetên zordar û hewldanên pijavtina çandî hemû nîşaneyên nasnameyê dagirkirbûn, hunera kurdî ne tenê wekî keyfxweşiyekê bedewî bû, lê ew mîna kelatek ji bo nasnameyê û minberek ji bo parastina bîreweriyê. Hunermend û stranbêjên Kurd ên hevdem, veguhêrîn parêzvanên ziman û çêkerên straneke ku di awaza xwe de taybetmendiyên xakê, qemûşkên dîrokê, hesreta nasnameyê û dengê gelên ku çîrokên xwe yên qedexekirî di riya awaz û gotinê vedibêjin hildigre û li hemberê hewldanên jêbirin û jibîrkirinê radiwestin.

Di vê çarçoveyê de, strana kurdî bûye amûra belgekirina gelerî, û embarek bo bîranîn û hesretê, ew êşa paşerojê û hêviya mayînê bi rîtma xakê û bêhna çiyayan re vediguhezîne, di nav wan dengên ku cewherê vê hunera berxwedêr nîşan dide, Xalid Cûdî diyar dike, ne tenê wekî stranbêjekî, lê wekî şahidê êşê, ku hunera xwe bi tevahî dêxe di xizmeta folklor, ziman û bîra civakî de, bi hunera xwe ya resen, ew pirekî di nav mîrate û xewnê de xêz dike û strana kurdî dike belgeyek zindî ji bo hebûn û pêdariyê.

Hunermend û stranbêjê kurd Mihemed Sadûn, yê tê naskirin bi navê( Xalid Cûdî) li gundê "Taqyan"ê ku bi herêma Silopî ve girêdayî ye û dikeve qontara çiyayê Cûdî ji dayîk û bavek Kurd (Elî û Ayşa) hatiye dinya yê, ew di himbêza malbatek neteweyî ya Kurd de ku bi dîroka xwe ya têkoşînê ya kevnare, bi dilsoziya xwe ya bi şoreşger û azadîxwazan re, bi hezkirina xwe ya kûr bi axa welêt ve, bi fedekariya xwe ya bêhempa bi doza Kurdî û parastina nasnameya neteweyî ve tê nasîn mezin bûye.

Ew di nav malbateke ku ji neh zarokan pêk tê (pênc law û çar keç) û di malekê de ku mîna baxçeyekê neteweyî, xuyan dike, ku tê de gulên têkoşîn û berxwedanê vedibin û tê de nirxên jiyanê ji kanîyên qurbaniyê tên vegotin ku zarok tê de bi evîna axê, eşqa ziman û girêdana bi nasnameyê ve mezin dibin jiya ye.

Xalid kurê Deşta Silopîya yê, ew bajarekê kurdî ye, li ser sînorên sê beşên Kurdistanê dikeve (Bakur, Başûr û Rojava). Ew heval cêwiyê rastî yê (Dêrika Hemko, Zaxoka Behdîna û Cezîra Botan e ). Ev zemîn bibû û hîn jî maye navenda hozên kurdî yên resen, wargehê folklora kurdî û dergûşek ji bo dengên gelêrî ên wijdana kurdî di bîranînê de dixemilînin, mîna Abdullah Silopî, Henîfa Şernexî û Kurdistana Spêrtî..

Di vê jîngeha ku tije ji rûhê neteweyî û nebza folklora kurdî, hişmendiya hunerî ya Xalid Cudî di nav wê de vedibe, ew ne li peymangehên mûzîkê fêrî stranbêjiyê bûye, lê ew ji gewriyên xwezayê fêr bûye, ji xumxuma Ava Dîcle dema ku çemê Hezîlê himbêz dike, ji baweşînên bayên Çiyayê Cûdî û Bexêr, ji pestînên zeviyên pembû û sirûdên bênderên genim, ji çîveçîva çivîkên ku stranan dibêjin ji bo azadiyê û ji vedenga guleyên ku şoreşger berdidin ji bo parastina ax û ziman.



Ji çavkaniyên gundê xwe yên xweşav, wergirt dersên yekem ên huner û stranbêjiyê. Ji destanên lehengên Kurdistanê, stand rûhê fedekariyê, ji dirûşmên şoreşgeran vexware wateyên pêdariyê. Dûvre, ew bû dengek ji dengên berxwedana çandî, parêzvanek dilsoz ê strana rastîn a kurdî û balyozek bo hunera ku bi avê, ax, xwîn û bîranînê hatî strandin, lê ev têkildariya eşkere û dilsoziya kûr a bi nasnameya Kurdî re, bûn sedema ku malbata wî bibe armanca şopandin û astengkirinê ji hêla dewleta Tirk û çeteyên wê ve, ku ev mala biçûk di çavên wan de wek bingeheka berxwedana neteweyî û çandî xuya dibû. wisa sirgûn çarenûs bû, ji ber vê yekê, malbat neçar man ku bi darê zorê koçber bibe û axa bav û bapîran li dû xwe bihêle û berê xwe bide Rojava, li bajarê Dêrikê gundê (Girkê Hêwil) di nav pismamên xwe de niştecih bibe û li wir di nava jiyana penabertiyê de dengê wî qet melûl nebû, lê ew zêdetir şewq û ronahî da, ji wê axa pêguhrok. Xalid babeteke nû ji çîroka hunerê vehûnand, wî xerîbî veguhêrand awaz, bîranînek ku nemire û dengê wê bû berdewamîya birînên ku qet qemûş negirtin û çîroka miletekî ku stran got da ku newê ji bîrkirin.

Wî qonaxa seretayî li gundê xwe, Girkê Hêwil û amadekarî li Girê Şêra û navîn li Dêrikê xwend, berî ku di sala 2007'an de biçê Şamê da ku kulîjeya Dîrokê bixwîne û ji ber xebata wî di nav çalakiyên candî û hunerî yên kurdî û beşdariya wî di nav tevgera ciwanan de, bû sedema ku ew rastî astengiyan ji hêla rejîma Sûrî ve were. Ji ber vê yekê ew neçar ma ku dev ji xwendinê berde û rêya têkoşînê ji bona xwe hilbijart û tevlî nava refên tevgera rizgarîya Kurdistanê bû. Xwe terxan kir ji bo karê neteweyî û çandî, bi rêxistinkirina çalakiyên hunerî di nav komên kurdî de û girêdana hunerê bi nasname û berxwedan ve da avakirin.

Ji zaroktiya xwe ve, Xalid ji stranbêjî û muzîka kurdî hezdikir, dema ku ew hîn heşt salî bû, meylên hunerî li cem wî destpêkirin di bin bandora mûzîka jîngeha tê de jiyan dikir û dengê hunermend Xelîl Xemgîn û hunermendên Botanê, ku di dilê wî de hestek xweparêzî û nasnameyê çandin.

Li gundê (Girkê Hêwil) di nav koçik û zeviyan de, gavên wî yên hunerî yên yekem bûn, wî di ahengên malbatî û neteweyî de, bi dengekî xembar, xwedan serpêhatî stran digotin, wekî sihbera Çiyayê Cûdî û hesreta gundên ku wî paş xwe ve hiştîn. Sirgûnê ew fêr kir ku stranan bêje, ne ji bo xweşxwazî yê, lê ji bo hişyarkirina bîranînê;

ji bo ku stran bibe stargehek ji bo penaberan hêviya dîtinê ji bo kesên ji hev dûr.

Piştî koçberiya malbata wî ji bo Rojava, di sala 1997'an de Xalid Cûdî tevlî koma Wanê li herêma Koçra bû, li wir pêngavên wî yên hunerî destpêkir. Di sala 2002'an de ew zewicî û ew bavê pênc zaroka ye (sê kur û du keç), di nav wan de hunermenda piçûk Sorxwîn jî heye, ew kurê şehîdê têkoşer Elî Teyî ye, ku li ser wî bandorek kûr a serbilindî û berpirsiyariyê hişt. Piştî wê, ew bi malbata xwe ve çû Şamê û li wir, piştî ku ew ji xwendina zanîngehê hate rawestandin di sala 2007'an de, di gel çend hevalên xwe koma "Zagros" avakir, ku bû navenda huner û pabendbûna wî ya neteweyî, ev xebata wî bû sedema ku bête şopandin û astengkirin ji hêla saziyên ewlehkariya Sûriya ve, di sala 2009'an de hat girtin û salek li zindanê ma, piştî wê jî di sala 2011'an de careke din hat binçavkirin û bo desthilatdariya dewleta Tirkiyê hat radestkirin, ji ber ku tu belge li dijî wî nehatin dîtin, paşê ew serbest hate berdan.

Bi destpêka Şoreşa Rojava, Xalid Cûdî dîsa vegeriya Dêrikê da ku têkoşîna xwe bidomîne û xebata rêxistinî û çandî berdewam bike, di dawiya sala 2011'an de, ew tevlî koma "Cûdî" bû, ku heta niha yek ji stûnên xebatkar û çalak ên wê komê dimîne.

Ew bi Koma Cûdî re beşdarî vejîna gelek şevbuhêrkên stranbêjî , konserên herêmî, û bûyerên neteweyî bûye, herwiha hebûna wî di nav çend festîvalên hunerî yên li hundur û derveyî parêzgeha Hesekê diyarbû. Di sala 2023,an de, ew çû Ewropayê, û beşdarî pîrozbahiya cejna Nowrozê li Frankfurtê bû,wekî din ew tevlî çar bûyerên hunerî yên din ên li bajarên cuda yên Ewropî hatine kirin bû, dengê xwe yê kurdî yê germ wî gihand guhdarên tîyên hunera resen, bi xwe re awazên welêt gihande dilê sirgûnê.

Beşdariya wî di konsertan û bûyerên kurdî de, li Dêrik û derveyî wê, ew yekem minber bûn ku gel li dora wî kom bû ,ne tenê wekî stranbêj, lê wekî yek ji zarokan vê dozê, ku bi zimanê wan diaxiv û bi êşên wan distirîne,bi vî rengî xerîbî veguhûrt dibistanek û sirgûn kire şanogehek û xembarî kire awazek newê ji bîrkirin. Ji Dêrikê, dengê wî derbasî ji gundekî ber bi gundekî din bû , heya ku ew di bîranîna mirovan de cih girt, û navê wî bû hevrê yê resenîyê û muzîka wî bû tevnek ji avê çeman û rondikê çiyan. Di rêwîtiya xwe ya stranbêjiyê de. Xalid tenê ji bo evîn û xwezayê stran negot. lê wî dengê xwe kir wekî minberekê ji bo doz û daxwazên gelê xwe, wî stran gotin ji bo şehîd û şoreşgeran. ji bo jin û rûmetê, ji bo welat û azadîyê, ji bo koçber û girtîyan, ji bo welatê parçebûyî, ji bo gundên ku piştî koçberî yê bêdengîyê dagirkirîn, wî strana kurdî gihand festîval û qadên çandî û bû balyozekî çandî û neteweyî ji bo doza gelê xwe. Wî dengê xwe kire pirek di nav nifşan de; Pîr û kalan jê hezkir ji ber ku têde dîtin vedenga rastîn, ciwanan ew himbêz kir ji ber ku qet bazirgêrtî li ser ziman û wateyê nekir.

Hunermendê Xalid bi ezmûna stranbêjiya duyanî (duet) û karê komalî jî re derbas bû, ku bi hejmarek hunermendên kurd û komên hunerî ên Kurdî yên navdare hevkariyê dike, di nav wan de (Koma Cûdî, Koma Wanê, Koma Zagros û Hunergeh) di heman demê de ezmûnek hevpar bi hunermendên navdar re wek (Delîl Mîrsaz, Hacî Zihêrî, Dicle Elyas, Hêvî Deham û yên din) bi hev re kirine, van tevkarîyên hunerî tecrûbeya wî dewlemend kir û cihê wî di meydana stranbêjiya kurdî de bihêz kir.

Ew di gel koma Cûdî, beşdarî tomarkirina gelek stranan bûye him di nav albûman komî de û him jî bi karên kesane yên taybet, ji stranên komî yên bi komê re gotî û dengdaneke berfireh di nav girsên gel de girtîn:

1-4'ê Nîsanê
2-Dehola Rojava
3- Apo Newroze
4-Şehîd
5- Kobanî
6- Şengal
7- Efrîn

Hinêra hunerî ya Cûdî tenê bi stranbêjîyê sînordar nema, derbasî nivîsandin û awazdêneriyê jî bû, wî gelek stranên kurdî nivîsandin û awaz ji wan re çêkirin mîna:

1-Her dem bijî Apê me
2-Sebra dilê min Sariya
3-Min dît hatin sê zarî
4-Haps û zindanan

Wî zêdetirî deh vîdyo klîbên stranbêjiyê pêşkêş kir ku pirtûkxaneya hunerê ya Kurdî bi stranên xwe yên şoreşgerî û peyvên xwe yên şêrîn dewlemend kir wek:

1- Her dem bijî Apê me
2- Azadî
3- Şehîd Sadiq
4- Şehîd Gelhat
5-Felaketim
6- Koçera Barkir

Ji destpêka xwe ve, Xalid li stranbêjiyê ne nêriye wekî pîşe an navdan, lê mîna peyamek û berpirsiyarîyek neteweyî hîs kiriye, ew bawer bû ku stranbêjî bi zimanê kurdî ew şêwazek ji şêwazên berxwedanê ye û her gotinek kurdî ku tê strandin di civatan de, ew alayek ku di rûyê jibîrkirinê de bilind dibe.

Li her gundekî ku ew têre derbas bû, dengê wî mîna bîhnxweşîyeka şevê li dû wî maye, di her festivalekê de ku stran got, dengê wî berî aleyan li asîmanan bilind dibû, navê wî hatiye nasîn di bûyerên neteweyî de û di stranên ku di çiyayên de têne gotin, û di bîranînên ku gel ji hev re dibêjin wek ku ew stranên veguhêzin.

Dengê wî tînê bîra me ku çand ne xweşîyeke, lê amrazek têkoşînê ye, û stranbêjîya kurdî ne bû û ne jê dibe tenê xweşbûnek, lê ew bû rêbazek bo parastina ziman, nasname û rûmeta neteweyî. Di demekê de ku ziman dihat qedexekirin, Xalid bi zimanê kurdî stran digo, wî dengê xwe kir wekî kiryarê berxwedanê û bi gotinên xwe tekez kir girêdana gel bi zimanê xwe yê dayikê ve, wekî ruhê nasname û xezneya bîranînê ye. Wî bi zaravayê Botanî stran got û ji çiyayên Cûdî û dayikên şehîdan re stran xwend, peyvên xwe ji mîrasê devkî wergirtin, ew nêzîkî gel bû, bi zimanê wan diaxivî.



## Şoreşa Rojava û berpirsyariya wêjeyê

**Remezan Olçen**

Di tevahiya dîrokê de, wêje hem şahid û hem jî hilgirê veguherînên civakî bûye. Mirovahiyê gelek caran di helbestên helbestvanan, çîrokên romannivîsan û vegotinên çîrokbêjan de serhildanên mezin, şer, şoreş û têkoşînên rizgariyê dîtiye, tecrûbe kiriye. Hêza wêjeyê ne tenê di afirandina estetîkî de ye, lê di heman demê de di kapasîteya wê ya afirandina bîranînan, parvekirina hestan û çandina hêviyê ji bo paşerojê ye.

Ji ber vê yekê, divê her şoreş wêjeya xwe biafirîne. Ji Komuna Parîsê bigire heya Şoreşa Rûsyayê, ji têkoşînên azadiyê li Amerîkaya Latîn bigire heya serhildanên gelêrî li Rojhilata Navîn, her tevgera civakî ya mezin hem bi cîhanê re û hem jî bi dînamîkên xwe yên navxweyî re têkiliya xwe bi rêya wêjeyê xurt kir. Şoreşa Rojava jş xwedan bangeke wisa ye. Ew daxwaza jidayikbûna wêjeyeke nû ya bi aliyên xwe yên siyasî, civakî û çandî dike.

Tê zanîn şoreşa ku ji sala 2012'an vir ve li Rojava geş bûye ne tenê berxwedaneke leşkerî ye; Ew hewldanek ji bo ji nû ve avakirina civakî ye ku li ser azadiya jinan, wekheviya di navbera gelan de, pirzimanî û jiyana hevbeş esas digre. Ev çarçove çavkaniyeke bihêz ji bo wêjeyê pêşkêş dike.

Ezmûnên li Rojava beşek ji dîrokekê ne ku divê neyê jibîrkirin. Wêje bi tomarkirina şahidiyan bîra şoreşgerî ava dike. Bi rastî, pirtûka "Kobanê" ya Sefqan Kobanê û "Kobanê Çepera Rûmetê" ya Meryem Kobanê beşek girîng ji vê bîrê ne. Bi vegotina rastiya wê qehremaniya mezin re berhemên bi vî rengî 'bîreke kollektîf' bîreke civakî jî çêdike.

Gotin û daxuyaniyên siyasî pir caran sar û dûr xuya dikin. Lê belê, wêje dihêle ku mirov bi çîrokên mirovan re empatî bikin. Romana Şaram Qawami ya bi navê Rojava: Romanek Azadiya Kurd çîroka jineke ciwan a li Berlînê vedibêje, ku bi lêgerîna xwe ya nasnameyê dest pê dike û ber bi şoreşê ve diêe, vedibêje. Li vir, pirek di navbera trajediya takekesî û têkoşîna civakî de tê çêkirin. Roman Rojava ne tenê wekî qada şer, lê di heman demê de wekî cîhek veguherîna hundurîn jî nîşan dide.

Helbest yek ji rêbazên herî bilez û bihêz ên derbirînê ye ji bo şoreşan. Berhevoka helbestan a Matt Broomfield a bi navê "Brave Little Sternums" û helbesta Thoreau Redcrow a bi navê "All that Rojava is", ku ji bo salvegera 12'an a Şoreşa Rojava hatiye nivîsandin, hem şîna li dû şehîdan nîşan didin û hem jî hêviyê zindî dihêlin. Ev metn û nivîs nîşaneya bi peyv û gotinê birêxistinkirina berxwedanê ne.

Wêjeya li Rojava ne tenê bi zimanê Kurdî, lê di heman demê de bi zimanên Erebî, Suryanî û yên din jî geş dibe. Berhevoka "Where the Sun Goes Home: Poetry from Rojava", ku ji hêla Words Without Borders ve hatiye weşandin, wekheviya wêjeyî ya pirzimanî pêşkêşî cîhanê kiriye.

Ev mînak nîşan didin ku wêjeya Rojava ne tenê "wêjeya berxwedanê" ye, lê di heman demê de lêgerînek estetîk e jî. Bingeha ku ji hêla kevneşopiya dengbejiyê tê, mîrasa helbesta şoreşgerî ya Cegerxwîn û Seydayê Tîrêj û romanên di van salên dawîn de li qadên şoreşê tên nivîsandin wêjeyeke li ser hîmê etîk û estetîka Apoyî pêş dixe. Di vê wêjeya ku berhema û çêkera şoreşê ye em paradîgmya ekolojîk, demokrastîk û azadiya jinê esas digre dibînin.

Lê tevî ku ev behrem û hêvî hene jî lazim e em bibêjin hîn jî ev kar û xebat bi sînor dimeşin. Dema wê ye ku wêje geş bibe û şoreşa xwe jî geş bike. Ev keys, derfet û îmkan ji her demê zêdetir hene. Wêjeya Şoreşa Rojava hîn di destpêka rêwîtiya xwe de ye. Kar û xebat ew e ku di vê rêwîtiyên de gavên bi himmet û mezin bavêje û bîra pirzimanî ya şoreşê bigihîne paşerojê. Her helbest, her çîrok, her romanek ku îro tê nivîsandin ne tenê ji bo îro lê ji bo sibê jî asoyên azadiyê ava bike.

# 'Deriyê aramî û ewlebûna Sûriyê bi vegera koçberan vedibe'

Parêzer û Berpirsê Ofîsa Têkiliyan a Komîteya Koçberên Serêkaniyê Ciwan Îso diyar kir ku dagirkerî herêmên dagirkirî kiriye cihê binpêkirina mafê mirovan û got, "Divê destpêkê pirsgirêkên di hundir Sûriyê de bên çareserkirin, bi taybet mijara koçberan, ji ber heya yek koçber di kampan de be, aramiya Sûriyê pêk nayê."

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

### Koka êrişên li ser Rojava ji Serêkaniyê dest pê kir

Rewşa Serêkaniyê ji destpêka aloziya Sûriyê ve li ser çend qonaxan ve pêk hatiye.
Ji sala 2012'an ve êrişa sereke ku li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê hat kirin, êriş li ser Serêkaniyê bû. Li hemberî wê berxwedan gelên Serêkaniyê, xelkên bajarên din û hêzên leşkerî YPG û YP'ê hate meşandin ku rûxmî pir êriş bi awayekî ne yekser ji aliyê dewleta Tirk ve hatin kirin, lê di aliyê locistîk, çek, temwîl, perwerde û hwd… de dewleta Tirk bû, êriş jî di bin gelek navan de hate kirin, lê heya 2019'an ew êrişên bi plan neçûn serî.

### Bi erêkirin û bêdengiya navdewletî û derdorê êriş pêk hat

Di istratîjiya dewleta Tirk de bû ku bajarê dîrokî weke Serêkaniyê dagir bike. Ji bo wê bê çare bû ku piştî ewqas hewildan ew bi xwe di 9'ê Cotmeha 2019'an êrişeke berfireh ji qonaxa duyemîn a êrişa bide destpêkirin. Ev qonax qaşo di bin navê "Kaniya Aştiyê" de bû, ji ber Serêkaniyê bi dîrok, berxwedan û kaniyên xwe tê naskirin. Lewma di 9'ê Cotmehê de dewleta Tirk rasterast hêzên xwe yên leşkerî bi hin erêkirinên navdewletî, bêdengiya gelek dewletan, alîkariya gelek dewletên derdor û bi navê gelek çeteyên qaşo dibêjin em ji bo azadiya Sûriyê li dijî rêjîma Baas a hilweşyayî kar dikin, hem bi bêdengiya rêjîma Baas, derbasî Serêkaniyê, Girê Spî kir û êrişeke hovane pêk anî.

Êrişa li ser Serêkaniyê li dijî mafê mirovahiyê bû. Ji ber dema tu sînorê dewletekê derbas bike bê destûra wê dewletê, ew dewlet jî bêdeg be wê sûcên mezin jî bên kirin. Di encama wê de êrişa leşekrî ji aliyê hezaran ji komên çete yên girêdayî dewleta Tirk û Tirkiyê bi xwe bi balafirên şer, çekên qedexekirî, şerê bejahî û hemû cûreyên çekan hate kirin. Tevî ku li hemberî vê yekê berxwedaneke bêhempa hate kirin jî, lê mixabin hemû cîhan di erêkirin û bêdengiya vî şerî de bû. Di encamê de xelkên bajarê Serêkaniyê, Girê Spî û gundewarên wê bi darêzn zorê ji malên xwe hatin derxistin û bajar hat dagirkirin. Hem jî wê demê hevpeymaneke di navbera dewlet Tirk û Emerîka, Tirk û Rûsya de pêk hat ku tevî bajar çûn jî agirbest bê ragihandin.



### Ji sedî 85 xelkên Serêkaniyê ji bajêr hatine derxistin

Armanca dewlet Tirk yek jê ku xelkên resen ên bajêr li seranserî sînor, bi taybet li bajarên Kurdan guhertineke demokrafîk tê de pêk bîne, li şûna wê xelkên ji derve bînin. Ev yek jî kirin ku niha xelkên li Serêkaniyê dimînin, ne xelkên wê yên resen in. Li gorî serjimariyên heyî li Serêkaniyê ji sedî 85 xelkên wê hatine derxistin. Gelek gund bi temamî hatin rûxandin û nêzî 60 gund bi temamî hatine valalkirin. Nêzî 5 hezar û 700 mal, nêzî 2 hezar dikanên bazirganiyê û bi sed hezarên donimên hêktarên erdên çandiyê heta roja îro di destê çeteyên dewleta Tirk de ne. Herwiha hejmara xelkên Serêkaniyê yên ku ji bajêr derketina nêzî 175 hezar insan in, tenê niha nêzî 45 kurd li wir mane. Di heman demê de hemû binpêkirin, sûcên mezin ên dijîmirovahî ku sûcên şer in li wir hatine kirin, ev yek jî di gelek raporên navdewletî û raporên Komîteya Koçbera ya Serêkaniyê de hatiye tekezkirin û belgekirin.

### Herêmên dagirkirî bûne cihê kuştina mafê mirovan

Serêkaniyê û Girê Spî berî 9'ê Cotmeha 2019'an cihê aramî û ewlehî bû ku xelkên wê xwe birêve dibir. Lê bi 9'ê Cotmehê bû cihê talankirin û kuştina mafê mirovan, hem jî bûye cihê ku dîsa çeteyên DAIŞ'ê xwe tê de birêxistin bike û ji wir êrişî herêmên din bike. Niha herêmên dagirkirî bûne bingehên xeterî û tehdîdkirinê. Rewş heya roja îro jî bi vî rengî dewam dike ku di kirîzeke mezin re di aliyê hiqûqî, mirovî û hwd… derbas dibe, ji ber civakeke xerîb li wir hatiye bicihkirin.

### Rewşa aloz a koçberên Serêkaniyê

Piştî dagirkirinê, koçberên Serêkaniyê di kampên ku ji aliyê Rêveberiya Xweser ve hatine çêkirin, hatine bicihkirin, lê ji ber tenê Rêveberiya Xweser û hin rêxistinên biçûk bi wan re alîkarin, rewşa wan xirab e. Berpirsyarên vê yekê jî Netewên Yekbûyî û dewletên din in, ji ber wan 2 sûcên mezin kirine. Yek jê rê dan dewleta Tirk ku derbasî sînorê dewletek din bibe û cinosaydekê li wir pêk bîne, sûcê duyemîn ew e ku netewên yekbûyî nikarbûn li kêleka van koçberan biksekin in, mînaka wê deriyê Tilkoçer heya roja îro girtiye, tevî li gorî rêziknameya wê ya hundir ku parastina mafê mirovan dike, lê yek ji van tiştan pêk nayîne.




### Siyaseta demdirêj

Herêmên dagirkirî bûne beşekî ne eşkere ji erdnîgariya Sûriyê ku ziman, al û diravên Tirkiyê li wan herêman tên bikaranîn. Herwiha siyaseteke ji bo armancên demdirêj tê kirin. Wekî ku di salên 70'î de hîzama erebî hate kirin, niha di qonaxa duyemîn de guhertineke erdnîgarî ya kur û berfireh bikin. Hem jî tiştên dîrokî yên di van bajaran de xerab dikin ku nasnameyên wan ên dîrokî winda bikin.
Berî salekê di raporeke Komîteya Koçberên Serêkaniyê de hatibû eşkerekirin ku li 3 gundên girêdayî Serêkaniyê madeyên hişbir hatine çandin, hem jî bazirganiyeke mezin li wir tê kirin, di heman demê de li wir nêzî 23 toreyên revandina mirovan û madeyên hişbir derbas dikin, hene. Herwiha li gorî serjimariya dawî ya komîteyê ku 75 caran şer di navbera çeteyên li wir çêbûye, ew jî ji bo mijarên derxistina mirovan û madeyên hişbir bû.

Derbarê rewşa Serêkaniyê ji destpêka dagirkirinê û heya niha, Parêzer û Berpirsê Ofîsa Têkiliyan a Komîteya Koçberên Serêkaniyê Ciwan Îso ji Rojnameya me re axivî.

Ciwan Îso diyar kir ku ew rewşa Serêkaniyê dişopînin û wiha got: "Em rewşa Serêkaniyê roj bi roj dişopînin, hem jî ji bo Serêkaniyê me gelek name û mizekratên qanûnî yên fermî ji gelek deveran wekî Netewên Yekbûyî, Wîzareta Karên Derve yên Emerîkî û hwd… re şandin û me muxatebeya gelek aliyan kir. Encam tenê sozên bi gotin bûn ku heta niha li ser erdê pêk nehatin, mînak nikarîbûn ava Elok a melyoneke mirov li ser wê bû heya roja îro ji bazarên siyasî derxînin. Sûcekî mezin tê kirin ku bajarê Hesekê û gelek deverên din ji avê hatine qûtkirin, hem jî Kampa Waşûkan û Serêkaniyê ku dixwestin ji ava xwe vexwin, lê ew jî li ser wan qût kirin, ji ber siyasteke piralî tê meşandin. Em jî hewil didin ev siyaseta ku dewleta Tirk dimeşîne ji raya giştî re eşkere bikin, ji ber ne tenê em dibêjin lê raporên mafên mirovan tiştê li wir tê kirin dibêjin."

### 'Ji sedî 1 jî guhertin pêk nehatiye'

Îso eşkere kir ku dewleta Tirk temsîla projeya parçekirina Sûriyê dike û wiha anî ziman: "Mixabin xelkên Sûriyê giştî, di nav de koçber piştî hilweşandina Baasê digotin wê Sûriyê derbasî qonaxeke nû bibe. Lê heta niha ew propaganda tê kirin di rêya ragihandina dewleta Tirk û hikumeta veguhêz a Sûriyê de tenê di çarçoveya teorîk de ye ku dibêje rewş arame hinek û guhertin çêbûn. Lê em wek Serêkaniyê vê tekez dikin ji sedî 1 jî guhertin pêk nehatiye. Dema tu li erdnîgariya Serêkaniyê dinere û rewşa niha ew herêm ne bi ser Sûriyê ve ye yê ku temsîla projeya perçekirina Sûriyê dike jî dewleta Tirk e. Ji bo wê sozên hatin dayîn di nav de yên hikumeta veguhêz heta roja îro nikarîbûn pêk bînin. Ji ber ew jî hîn negihaştine wê baweriyê ku ji bo pirsgirêk çareser bibe, gerek ji hundirê Sûriyê bê destpêkirin, lê gavên ku wan kirin yekalî bû. Em dizanin Şam di demekê de bibû mezar her kes diçûn û dihatin, lê her kes behsa koçberan nedikirin. Ji ber wê siyaseta hikumeta veguhêz li gorî rê, rêbaz û biryarên dewleta Tirk tê meşandin."

### 'Deriyê aramiyê di vegera koçberan de vedibe'

Îso anî ziman ku lihevkirina 10'ê Adarê gelekî girîng bû û wiha pê de çû: "Lihevkirina 10'ê Adarê ya ku di navbera QSD'ê û hikumeta veguhêz a Sûriyê de pêk hat gelekî girîng bû. Ji ber di istratîjiya Rêveberiya Xweser de û di nav xalên sereke ku cihê nîqaşê bû, xala koçberan bû. Heta koçberek tenê di bin konekî de bimîne, tê wê wateyê ku pirsgirêka Sûriyê çareser nabe. Aramî û ewlehiya Sûriyê bi aliyê wê yê destûrî ku siberoja Sûriyê zelal bibe, ya din gerek her koçberek vegere mala xwe, vegereke biewle, bê dagirkerî, bê teror û bê xeterî, girêdayî ne. Lê hikumeta veguhêz heya roja îro ji wê lihevkirinê direve, ev jî li gorî biryarên dewleta Tirk e. Ji ber dema ev lihevkirin here serî, wê demê pêwîst dike dewleta Tirk ji Sûriyê vekişe. Deriyê aramî û ewlebûna Sûriyê di vegera koçberan de vedibe."

### '6 sal di ser dagirkirina Serêkaniyê re derbas dibe'

Ciwan Îso axaftina xwe wiha qedand: "Hisabatên dewleta Tirk li herêmê gelek in, dibe ku di demên pêş de şerekî navxweyî di navbera xelkên resen û xelkên ku ew anîne herêmên dagirkirî, derxîne. Ji bo em rê li ber vê bigirin gerek ew projeyên îro tê kirin, bisekinin. Niha rûxmî destê dewleta Tirk û çeteyên wê li ser mal û milkê Serêkaniyê ye, lê ne bi rengekî qanûnî ye. Ji bo niha ew dixwazin bi rengekî qanûnî mal û erdên xelkên Serêkaniyê bikirin û wan bidin çeteyan. Lê me jî wek Komîteya Serêkaniyê me gelên xwe yê Serêkaniyê hişyar kir ku gerek em xwedî rol û bertek bin li hemberî vê, hem jî wek erekekî welatparêzî û qanûnî gerek kes erdê xwe nafiroşin wan. Meheke maye ku 6 sal li ser dagirkirina Serêkaniyê derbas bibe, lê xweneke ji bo me ku em vegirin malên xwe û siyaset bidawî bibe."






# 'Azadiya Rêber Apo daxwaza tevahî gelên herêmê ye'

Serokê eşîreya Al-Ikêdat a Erebî Ebdelmunim Elxatir diyar kir ku kampaniya 'Ez dixwazim bi Rêber Apo re hevdîtinê bikim' têkiliya kûr a di navbera Rêber Apo û gelên herêmê de nîşan dide û wiha got: "Vê kampaniyê ji cîhanê re da xuyakirin ku daxwaza azadiyê Rêber Apo ne daxwazeke partiyekê an gelekî ye, lê ew daxawaza tevahî gelên herêmê ye."

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Di 27'ê Sibatê de "Banga Aştî û Civaka Demokratîk" ya Rêber Apo hat eşkarekirin, ev bang li tevahî cîhanê deng veda û bandoreke mezin li ser tevahî pêkhateyan kir. Piştî vê bangê di 14`ê Gulana 2025`an kampaniya gerdûnî ya bi dûrişmeya "Ez dixwazim bi Rêber Apo re hevdîtinê pêk bînim' hate destpêkirin, li tevahî cîhanê û bi taybet li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi tevlîbûneke mezin dewam dike. Di derbarê kampaniya 'Ez Dixwazim bi Rêber Apo re Hevdîtinê Bikim' û tecrîda ku heya roja îro li ser Rêber Apo didome, Serokê eşîreya Al-Ikêdat a Erebî Ebdelmunim Elxatir ji Rojnameya me re axivî.
Ebdelmunim Elxatir di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser banga Rêber Apo ya Aştî û Civaka Demokratîk û wiha domand: "Banga Rêber Abdullah Ocalan ya 'Aştî û Civaka Demokratîk' ku di 27`ê Sibatê de da eşkere kirin, ji bo tevahî gelan cihê hêvî û çareseriya pirsgirêkan e, di heman demê de ji bo ew gelê bindest û ji azadiyê bê parin , bû rêya ronahiyê. Herwiha ev bang gaveke wêrek û dîrokî bû ji bo bidestxistina aştî û aramiyê li herêmê. Ev qonaxa nû jî ji bo çareseriya pirsgirêkên doza kurdî û çareseriya tevahî pirsgirêkên tevahî gelan wê bi rêbaza demokratîk û biratiyê pêk were. Lê mixabin ji bo qonaxa nû ya 'Aştî û Civaka Demokratîk' heya roja îro tu dewlet gevên cidî ne avêtine, mînaka herî nêz azadiya Rêber Abdullah Ocalan a fîzîkî û girtiyên siyasî pêk nehatiye. Aştî bi aliyekî tenê wê nebe, pêwîst e ji hemû aliyan ve aştî pêk were û pêvajoyekî hevpare bê meşandin, ne tenê gotin be. Ev projeya Rêber Apo ya Aştî û Civaka Demokratîk' pirojeyekî xelaskirina ji zilm, şer, kuştin, komkujî û inkarkirinê ye. Ji ber vê yekê divê her kes erka xwe bi cih bîne û xwedî li banga Rêber Apo derkeve, ji ber ku ew tenê rêya azadî, aştî û rûmetê ye."



### 'Em tecrîdê bi tundî şermezar dikin'

Ebdelmunim Elxatir da zanîn ku siyaseta dewleta Tirk dide meşandin rê li pêşiya jiyaneke bi aştî digre û wiha got: "Em bi tundî her cureyên îşkence û nêzîkatiyên nemirovanî ya li dijî girtiyan red û şermezar dikin, bi taybetî dema ku mijar bi kesayetekî girîng mîna Rêber Apo eleqedar be ku zêdetirî 26 sal di girtîgehê de derbas kiriye. Heya roja îro tecrîd li ser Rêber Apo didome û bêparkirina ji mafên wî yên bingehîn, di serî de mafê hêviyê, ev binpêkirineke eşkere ku dewletên navneteweyî û mafên mirovan bi erekên xwe yên mirovî û exlaqî ranabin."

### 'Azadiya Rêber Apo daxwaza tevahî gelên herêmê ye'

Elxatir di berdewamiya axaftina xwe de wiha anî zinam: "Kampaniya 'Ez dixwazin bi Rêber Apo re hevdîtinê bikim' hişmendî û îradeya gelan nîşan dide. Ev Kampanyaya têkiliya kûr a di navbera Rêber Apo û gelên herêmê de nîşan dide û piştrast dike ku daxwaza azadiyê ne daxwazeke partiyekê yan gelekî ye, lê daxwaza tevahî gelên herêmê ye. Zexta gel li ser asta navneteweyî yek ji girîngtirîn amûrên guhertinê ye, herwiha çiqas ku ev kampaniya berfireh bibe, ewqasî derfetên bandorkirina li ser helwestên navneteweyî yên li ser doza Rêber Apo zêde dibin. Bêguman projeya Neteweya Demokratîk a ku ji aliyê Rêber Apo ve hatiye pêşniyarkirin, ne projeyeke neteweyî ango yekalî ye, lê belê banga jiyana bi hev re ya gelan e ku li ser bingeha edalet û wekheviyê ye. Ev raman di nav civaka Ereb a Bakur û Rojhilatê Sûriyê de deng veda, tê zanîn ku di destpêka şoreşa Rojava heya roja îro, Ereb, Kurd û Suriyan her mil bi mil bûn ku beşdarî avakirina Rêveberiya Xweser bûn. Vê projeyê di avahiya civakê de guhertinên radîkal bi xwe re anî, bi taybetî di xurtkirina rola jinan, pêşxistina ruhê beşdarbûnê û naskirina cihêrengiya çandî û olî de. Ev sîstem li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ne hatibû rûşkandin, lê piştî avakirin projeya Netewa Demokratîk û Rêverberiya Xweser ku ji aliyê Rêber Apo ve hatiye derxistin, ev piroje roj bi roj li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê xurtir û aktîvtir dibe."

### 'Divê em hemû vê berpirsyariya dîrokî bigrin ser milê xwe'

Ebdelmunim Elxatir di dawiya axaftina xwe de got: "Di encamê de, em dibêjin ku aştiya rastîn ne bi zordarî û şîdetê tê avakirin, lê belê bi diyalog û naskirina mafên hevpar tê avakirin. Rêber Abdullah Ocalan projeyek pêşniyar kir ku ji bo hemû gelên herêmê bibe çareseriyeke mayînde û adil. Ji ber vê yekê azadiya wî ya fîzîkî ne pirsgirêkeke şexsî ye, lê meseleya gelên ku ji bo edalet, rûmet û jiyana bi hev re têdikoşin e. Divê em hemû li bi vê berpirsyariya dîrokî rabin."

# 'Dûrxistina gelên Sûriyê ji hilbijartinan wê fermiyetê nede hikumeta veguhêz'

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

**Berdevkê Partiya Niştîmanî ya Sûrî Mihemed Derwîş da zanîn ku wê hikumeta veguhêz bi hilbijartinên yekalî hêviyên gelên Sûriyê têk bibe û wiha got: "Dûrxistina dengê gelan ji hilbijartinên parlementoya Sûriyê wê fermiyetê nede hikumeta veguhêz li ser asta navdewletî."**

Di dema heyî de hikumeta veguhêz beriya ku serokê wê biçe Amerîkayê dixwaze bi pêkanîna hilbijartinên parlementoya Sûriyê rewatiyê bi dest bixe û nîşan bide ku bi awayekî asayî Sûriyê bi rê ve dibe. Weke tê zanî partî, saziyên demokratîk, qanûn û kampayaya hilbijartinan li Sûriyê bi taybet li deverên di bin desthilata hikumeta Sûriyê ya veguhêz de, tune ne. Tevî tunebûna derfetên pêkanîna hilbijartinan jî da ku Sûriyê were parçekirin, herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Siwêdayê hatin dûrxistin ji hilbijartinan. Derbarê heman mijarê de berdevkê Partiya Niştîmanî ya Sûrî, Mihemed Derwîş ji rojnameya me re axivî.




### 'Wê hilbijartinên yekalî hêviyên gelên Sûriyê têk bibe'

Derwîş da zanîn ku wê hikumeta veguhêz bi hilbijartinên yekalî hêviyên gelên Sûriyê têk bibe û wiha got: "Me weke Partiya Niştîmanî ya Sûrî daxuyaniyek derbarê hilbijartinên parlementoya Sûriyê da, em dîsa dibêjin ev hilbijartinên ku hikumeta veguhêz ferz kirin û wê bimeşîne, dubarekirineke ji hişmendiya rêjîma Baas e. Hikumeta veguhêz bi rengekî yekalî û li gorî xwe tevdigere û van hilbijartinan ji bo xwe bikar tine, herwiha destwerdanên di nêrîna gelên Sûriyê de dike. Di heman demê de ew hêviyên gelên Sûriyê ji bo azadî û demokrasiyê têk dibe, hem jî nahêle ku tevahiya gelên Sûriyê di avakirina siberoja xwe de xwedî biryar bin. Dûrxistina deverên weke Reqa, Hesekê û Siwêdayê ji van hilbijartinan bi hinceta bêewlehiyê tenê ji bo pêkanîna berjewendiyê siyasî yên hikumeta veguhêz e. Deverên wiha parçeyên mezin ji laşê Sûriyê ne, dê çawa rûbereke mezin ku dengê milyonê mirovan were paşguhkirin û çawa welatekî yekgirtî bê avakirin. Em bi rengekî eşkere dibêjin ku ev hilbijartinên parlementoya Sûriyê li gorî zangonên niştîmanî yên Sûriyê, kêm dimînin û bê nirx in. Piştî ewqas dem ji şoreşa ku gelên Sûriyê dan meşandin, êdî dema paşguhkirinê çû û nema vedigere. Çi hilbijartinên ku nebe deng û daxwazên gelên Sûriyê, ew hilbijartin kêm in û dûrî sinc û zangonên navdewletî ne."

### 'Eger hilbijartin dûrî daxwazên gelên Sûriyê bin wê neyên qebûlkirin'



Mihemed Derwîş diyar kir ku eger hilbijartin dûrî daxwazên gelên Sûriyê bin wê tu carî neyên qebûlkirin û wiha domand: "Di Sûriyê de jiyana siyasî û partî hatine qeydkirin, li aliyê din tunebûna diyaloga di navbera gelên Sûriyê de, hem jî dûrxistina gelên Sûriyê ji daxwazkirina mafê xwe û neqebûlkirina pirrengiya gel û netewan, binpêkirineke ji perensîbpên exlaqî û siyasî. Siyaseta neqebûlkirinê metirsiyê li cem me ava dike ku Sûriyê parçe bibe. Xewna ku me dixwest ji bo avakirina Sûriyeke demokart ne bi silogan û axaftinan e. Lê xewna me bû ku Sûriya li gorî wê soz û xwîna gelên Sûriyê were avakirin. Em Sûriyeke demokrat, pirreng li ser bingeha azadiya gelên wê dixwazin. Em Sûriyeke şikestî, bêhêz û li gorî berjewendiyên aliyên derve kar bike, were avakirin. Ji ber wê jî çi hilbijartinên ku bêyî vîn û daxwaza gelên Sûriyê bin, hem jî deverên bingehîn werin paşguhkirin, pêk werin, wê cihê nerazîbûnê bin. Deng û nerîna gelên Sûriyê rasteqîntir e ji hemû dengên siyasî yên dûrî rastiya gelên Sûriyê."

### 'Pêwîstiya gelên Sûriyê bi hilbijartinên azad û hevpeymaneke civakî heye'

berdevkê Partiya Niştîmanî ya Sûrî, Mihemed Derwîş dest nîşan kir ku pêwîstiya gelên Sûriyê bi kongireke giştî ya niştîmanî û peymaneke civakî heye û wiha qedand: "Riya çareseriya pirsgirêkên gelên Sûriyê zelal e, divê kongreyeke niştîmanî ya piralî li ser asta Sûriyê were lidarxistin û tê de makezagon an jî hevpeymaneke civakî were derxistin, di heman demê de bi awayekî rasteqîn û azad hilbijartin çêbibin. Herwiha ev hilbijartin bibin neynika daxwazên gelên Sûriyê û nebin amûrek di destê aliyekî tenê de. Em bi tu awayan hilbjartinên ku tê de deverên bingehîn hatine paşguhkirin qebûl nakin. Rêkûpêkî û statûya hikumetan girêdayî ye bi vîn û nûnertiya gelên wê ve ye. Lê em dibînin tevahiya pêkhateyên Sûriyê ji hilbijartinên parlemento hatine paşguhkirin, ev dûrxistin jî wê fermiyetê nede hilbijartinê parlementoyê li ser asta navdewletî."

# 'PYD`ê bû nûnera pêkhateyên herêmê'

Hevseroka PYD`ê Perwîn Yûsif diyar kir ku PYD`ê di bingeha xwe de rêxistinbûyîna xwe ji rêxistinbûyêna gel digre û wiha got: "PYD`ê karîbû hemû pêkhateyan li derdora xwe kom bike û bibe cihê çareseriyê."

**Viyan Egîd/Qamişlo**

Derbarê salvegera damezrandina Partiya Yekîtiya Demokrat PYD`ê Hevseroka PYD`ê Perwîn Yûsif bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

### Girîngî û armanca damezirandia PYD`ê çi bû?

Di destpêkê de em salvegera damezrandina partiya xwe PYD`ê li hemû endam û gelê ku baweriya xwe bi stiratîjiya partiyê anîn e ku di rojên zehmet de bi giranî tevlî vê partiyê bûn, li ser vê bingehê em li wan pîroz dikin. Partiya Yekîtiya Demokratîk 22 salên xwe temam dike û derbasî sala 23'an dibe. Di demeke ku Sûriyê û tevahî Rojhilata Navîn di nava nejetperestiyeke giran de derbas dibû ku Kurdîtî qebûl nedikirin û ji bilî jiyana yek al û yek pêkhate ne dihat hewandin. Dewletên dagirker û hegemon li ser asta Kurdistanê şer û pevçnên mezin dan destpêkirin û bi awayekî dijwar dan meşandin, da ku Kurd werin windakirin û her kurdek dîrok û nasnameya xwe bide jibîrkirin û bi demê re were asmîlekirin. Yek ji van mînakan Rêjîma Baasê bû, gelek zilm û zordarî li Kurdan kir, di heman demê de li Tirkiyê dewletê li ser gelê Kurd gelek komkujî pêk anîn, bi heman rêbazî li Îran û Îraqê jî ev zilm li ser Kurdan dewam kir, ev êrişên ku li ser Kurdan dihatin meşandin, bi armanca tunekirina Kurdan bû.

Armanca avakirina Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD`ê ew bû ku dan û sitandinên bi gelê Sûriyê re bikin û danesîna vê partiyê ji wan re bidin xuyakirin. Rastî di sala 2003`an pêwîstî hat dîtin ku partiyeke siyasî mîna PYD`ê were damezrandin, li ser vê esasê Partiya Yekîtiya Demokratîk di sala 2003`an de hat damezrandin. Ji ber ku siyasetek raste rast li dijî nejetperstiyê dihat meşandin. Çiqas em bêjin ku zemînek mezin ya Tevgera Azadiyê li Rojavayê Kurdistanê hebû ku gelê me piranî tevlî tevgerê dibûn. Bi vê baweriyê partiya PYD hat avakirin û ji Tevgera Azadiyê nehat qutkirin ku li ser fikir û felsefeyekî karê xwe didan meşandin, partiya me bû mîna danasîna Rêber Apo li Rojavayê Kurdistanê, di heman demê de ji bo baweriya gelê Kurd û qebûlkirina hemû pêkhateyan. Yek ji mercên me yên esasî danasîna fikr û felsefeya Rêber Apo ji gelan re were pêşkêşkirin. Ji ber ku em dixwazin pirojeyên xwe li ser fikrê Rêber Apo bimeşînin. Di heman wextî de da ku gelê Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bikaribin xwe bi xwe rêxistin bikin û hêza



wan a siyasî xurtir bibe. Bêguman Partiya Yekîtiya Demokiratîk bû mîna cihek kombûyîna Kurdan û hemû pêkhateyan, kurd xwe bi vî rengî birêxistin kirin. PYD`ê bû wesîleyek siyasî di navbera Rêjîma Baas û gelê Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê da ku hebûna Kurd li ser erdê û çarenûsa Sûriyê de bidin qebûlkirin. Ji ber vê yek me pêwîstîk û qonaxek girîng bû ku PYD`ê di 2003'an de were avakirin.

### PYD`ê di avabûne xwe de û heya roja Îro, heya çi astê karîbû bibe partiyekî gelêrî, niştîmanî û Sûrî?

PYD'ê di bingeha xwe de rêxistinbûyîna xwe ji rêxistinbûyêna gel digre, di nav refên partiyê de bê şert û merc hemû pêkhate tevlîbûn. Me nexwest em rêbazek yek al di partiyê de ava bikn, lê belê me ji bo hemû pêkhateyan ev partî ava kir û bûye partiyekî pirrengî. PYD`ê gelek meclisan di nava xwe de dihewîne, mîna Melisa Jin, Mecilsa Ciwanan, Nivîsgehên Diplomasî yên ji bo dan û sitandinên derve û hundir hene. Di destpêka şoreşa Rojava de zemîneke partî pir mezin hebû ku pêşengtî ji bo avabûna Rêveberiya Xweser kir. Bi taybetî jî bi pêşengtiya jin hat pêşxistin, pergala hevserokatiyê xurt kir û di nava civakê de dan qebûlkirin. Ji ber vê yekê PYD`ê li gor xwestekên civakê û demê bû bersiv ku me karîbû hemû aliyên civakê di nava xwe de himbêz bikin.

### Di qada siyasî û diplomasî de PYD`ê çiqas deskeftî bidest xist?

Di aliyê diplomasî de, wek tê zanîn ku rêjîma Baas her dixwest me ji cîhanê re bide nasîn ku Kurd pêkhateyeke veqetandinê dixwazin. Ev bû baweriyek li cem hemû pêkhateyên Sûriyê ku Kurd tenê armanca wan veqetandine, ev siyaseta paşverû bû sedem ku hemû pêkhate bi çavekî cude li Kurdan mêze bikin, lê piştê ku me PYD`ê da avakirin û ji hemû pêkhate û cîhanê re hat zelalkirin ku Kurd mafê xwe dixwazin. Ji ber diplomasiya me li ser esasê hevpeymana civakî tê meşandin û gelek hevpeyman bi gelên Sûriyê, bi partiyên Sûrî û niştîmanî re hatin çêkirin. Têkilî û dan û sitandina me bi gel re nehat qutkirin da ku pirojeya Rêveberiya Xweser baş were fêmkirin. Gelek dostên partiya me çêbûne ji ber wê em bûn endamê kongireya Sosyalîsta civakî ne, ev kongir jî di hundirê xwe de hemî partiyê civakî yên ku bi fikrê sosyalîst hatine avakirin, di nava xwe de dihewîne, ev kongr jî kongreyekî cîhanî ye. Di heman demê de em endamê meşa jin a cîhanî ne. Partiya me di hundirê Sûriyê de û derveyî Sûriyê gelek xebatên biratiyê dan meşandin û di Rojhilata Navîn û cîhanê de gelek dostên xwe çêkirin. Me karîbû di riya partiya xwe de rastiya şoreşê heya roja îro li ser çarenûsa Sûriyê tê nîqaşkirin, em jî wek partiyeke pêşeng û çavê civaka xwe dixwazin bi hemû hewildanên xwe Sûriyeke demokratîk û bi pîvanên adaleta civakî were avakirin, bêguman pêwîst e hemû pêkhateyên Sûriyê cihê xwe di nav de bigrin. Li ser vê bingehê em karê xwe didin meşandin, komîteyên me yên ku niha bi hikumeta veguhêz a Şamê re dan û sitandinê dikin bi israr û xwedî derketina li destkeftiyên şoreşê û parastina wê, hemû pîvan û têkoşînin me dan meşandin di destûr û pêşeroja Sûriyê de pêwîst e mayînde bibe. Di heman demê de pêwîst e ji aliyê hevpeyman û ji cîhanê re raber bikin û dengê şoreşa xwe ji tevahê gelan re me da xuyakirin, niha Şoreşa Rojava li tevahî cîhanê deng vedaye. Bêguman di Rojhilata Navîn de em ji wiha zêdetir karîbin ku nasnameya gelê Kurd û tevahî pêkhateyan siyasetek raste rast bidin meşandin. Em di vê baweriyê de ne ku rojên li pêşiya me wê destkeftiyên mezintir werin bidestxistin.

### Istratîjiya kar û xebatên PYD`ê yên demên pêş çi ye?

Em ne li gor partiyek qalib û kilasîk dimeşin, lê belê gavên ku partiya me avêtin gelek patiyên kilasîk dan şikandin. Ew partiyê kilasîk her dem xwe bi kesayetekê tenê piştrast dikin, lê Partiya Yekîtiya Demokratîk her sal kongireya xwe li dar dixe û hevserokên nû tên hilbijartin. Herwiha li vir jî rolek herî sereke a ciwanan e. Stratîjiya kar û xebatên me li gor şert û mercan xwe nû dike. Wek ku tê zanîn cîhan di nava guhertin û veguhertinek mezin de ye û bi taybetî guhertinên siyasî lihevkirinên heyî tên guhertin, ev guhertinên siyasî jî di Sûryê û Rojhilata Navîn de derbasdar e. Piştî hilwişîna rêjîma Baas ku niha rêjîmek nû xwe li şûna wê girtiye ku têkiliyên xwe de gavên xurt bavêjin. Di navdewletî de jî hîn bihtir em bikaribin siyaseta xwe ya nû ji wan re parve bikin û dostên xwe yên nû jî çêbikin, herwiha mafê rewa yê ku gelê Sûriyê û bi taybetî gelê ku ji bo maf û jiyana azad têkoşîn kirin û tevlî şoreşê bûn, em bikaribin xwedîderketineke navdewletî ji vî gelî re bidin avakirin. Ji ber ev guhertin û veguhertina di hundirê Sûriyê de tê çêkirin ji bilî îradeya gel e. Em ê hewil bidin ku zextek mezin li ser hikumeta veguhêz a Şamê çêbikin, ji ber ku ev kiryar û biryarên tê kirin nexwestekên gel e û pêwîst e ev rêbaza dare zorê ji hole were rakirin. Careke din jî em dibêjin ku partiya me partiya gel e û ji destpêka damezrandina wê heya roja îro gelek berdelê giran hatine dayin. Li ser vê esasê em hemû hevalên ku ji bo vê şoreşê û jiyana azad canê xwe feda kirine bi rêzdarî wan bîr tînin û salvegera damezrandina PYD`ê li wan pîroz dikin, di heman demê de em soza xwe ji bo hemî gelê ku baweriya xwe bi partiya me anîn, nû dikin, ev partiya ku bi xwîna şehîdan hatiya mezin kirin, em ê roj bi roj mezintir bikin û bi taybet xwedî li şoreş û destkeftiyên jin derkevin.

---



## Şevreşa herî tarî ya berî şifeqê ye!

**Ahmet Aktaş**

Mirov bala xwe dide siyaset û kiryarên hegemonên cîhanê, yên van salên dawî, madê mirovan dixelîne, weke ku bi zanebûn dixwazin jiyanê li ber çavên civakê reş bikin.
Vê gotina pêşiyên me tîne bîra mirovan; ev şevreşa herî reştir û tarîtir, ya herî nêzîkî şifaqê ye.
Gotin "behara ereban" tê, lê zifistana herî malxerab anîn serê Ereban û ka wê kengî bi ser xwe ve werin û jiyana xwe dîsa ji nûve sererast bikin, nayê zanîn.
Gotin em ê demokrasiyê bînin Iraqê, lê hema tu dikarî bêje kevir li ser kevir nehiştin û bi sedhezaran kes hatin kuştin, lê demokrasî li kuderê ma û wê kengî were bi destxistin ne diyar e.
Xwedê giravî wê ji Tûnisê despê bikira, lê nuha hemû dewletên Ereban, Efrîqîyan di çi halî de ne û çawa dinalin li ber çava ne.
E ha Sûdan, Libya, Yemen û hwd... rewşa wan bi giştî ji hevdu xerabtir in, hemû di nava şer û pevçûnan de ne.
Piştî bûyera rûxandina herdu xaniyên cêwî yên li DYEyê, ji bo dest dirêjî dewletên jê hez nakin, wan bi ruxînin, dest bi amadekariyên rêpaqijiyê kirin û wisa diyar bû ku kelemê herî mezîn Rêber APO bû, hema bi plangeriyek navdewletî ya lezgin ew dîl girtin.
Piştî vê kompoloya navdewleti, pêşî destdirêjî rejima Efxanistanê kirin, ew rûxandin, li şwîna wê rejîmek li goreyî xwe dan rûniştandin.
Li pey wê Iraq, Libya, Yemen û qonaxa dawî Sûriye bû, nuha jî Îran di rêzê de ye.
Lê di nava van hel û mercên ewqas giran de, mijara herî balkêş ev e ku, rejimên dirûxînin şwîna wan ne pergalên demokratîk, berovajî, pergalên herî kevneperest û xwînrij bi cîh dikin. Her wiha ji bo îslamê jî xerab bidin nîşandan, desthilatên wan hemû bi navê misilmaniyê pênase dikin.
Hema li pey rejima Efxanistanê, li Suriyeyê jî bi heman nav û bi heman naverokê pergalekê ava dikin.
Ya xerabtir, rejîma Receb Erdoganê bi heman zihniyetê, 22 sal in li hemû parçeyên Kurdistanê êrîşên komkujî û qirkirinê dide meşandin, nuha weke koordînatorê van rejiman erkdar dikin.
Jixwe Receb Erdogan, zihniyeta xwe venaşêre, aşkere dibêje "baweriya me nêzî hev in, em dikarin bi hevre her karî bikin"!
Li Suriyeyê berê Beşar û Birayê xwe desthilat bûn, nuha jî Colanî û her du birayên xwe desthilat in.
Gelo ti cudahî heye di navbera her du desthilatiyan de?
Xala pir sosret û bobelat, hilwesta piraniya dewletên navdarên cîhanê ya bi Colanî re ye, weke 'qumaşê Hind û Yemenê' peyda kiribin û ji bo lihevparkirinê ketine nava pêşbirkê; li pey hev Colanî vedixwînin welatê xwe, nuha jî vexwendine New Yorkê civîna YN!
De fermo li "edaleta^ vê cîhana serdest temaşê bikin!!!
Jixwe Receb Erdogan û kurtêlxwurên xwe Ibarahim Kalin, Hakan Fidan û Yaşar Guler, rêya Şamê kirine rêya mala xwe! Weke ku bê Colanî, xwarin di qirika wan re naçe!
Lê belê weke pêşiyên me gotine; "ev şevreşa herî tarî ya herî nêzîkî şifaqê ye", wate, ev dema hilweşandina herî nêz a van rejimane!

---



# Seyîd Evran çiraya heqîqetê ye, rêya rojnamevanan ronî dike

Seyîd Evran yek ji pêşengên rojnamevaniya Kurdistanî ya azad bû, bi bisporî, pênûs, kamîre û bîrweriya xwe derbasî dilê rojnamevanên azad bû. Du sal li ser şehadeta rêheval Seyîd Evran derbas bûn, tevî dirêjahiya dema şehadeta wî, lê ew mîna mûmekê ye û rêya me ronî dike.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

### Gavên Seyd Evran ber bi tevgera azadiyê ve

Seyîd Evran bi navê xwe yê rast Seyîd Mehmûd Evran sala 1969'an li navçeya Hênê ya Amedê çavên xwe li jiyanê vedike. Di nava malbateke ji kevneşopiya serhildana Şêx Seîd de mezin dibe. Di salên ciwantî û xwendekariyê de têkoşîna azadiyê nas dike û di nava refên wê de cihê xwe digire. Dema li Zanîngeha Çukurovayê dixwîne, yek ji pêşengên Çapemeniya Azad û Şoreşger Gûrbetellî Ersoz ku wê jî li heman zanîngehê dixwend, nas dike. Bi vê naskirinê re dibe şagirtek Gûrbetellî Ersoz û ezmûnek girîng digire. Di sala 1990'î de li Amedê tevlî nava refên têkoşîna azadiyê bû. Seyîd bi vê xwestek û kelecanê sala 1990'î li warê serhildan û berxwedanê



Amedê, beşdarî nava refên têkoşîna azadiyê dibe. Dîroka bi êş ya welat berpirsyariyeke mezin dide ser milên wî, lewma ew jî bi vê zanebûnê tevdigere û li Tirkiye û bakurê Kurdistanê dest bi xebatên çapemeniyê dike. Dema navenda rojnameya Ozgur Ulke ya li Stenbolê û ofisên wê yên Enqere û Amedê 3'ê Kanûna 1994'an di heman şevê de hatin bombekirin, hevrê Seyîd jî li navenda giştî ya rojnameyê wekî Berpirsyarê Karên Nivîsê erk dimeşîne. Di wê êrîşê de heval Seyîd jî li gel 23 hevalên xwe birîndar dibe. Li Tirkiye û Bakurê Kurdistanê di xebatên çapemeniyê de cihê xwe digire. Herwiha bû yek ji mamoste û şagirtên Akademiya Şehîd Gurbetllî Ersoz. Di heman demê de ew ji damezrînerên YRD'ê.

### Li Rojava bingeha çapemeniya şoreşê danî

Dema sala 2012'an li Rojava pêla şoreşê bilind dibe, hevrê Seyîd jî berê xwê dide Rojavayê Kurdistanê. Li aliyekê rastiya şoreşê vedibêje û dinivîse, li aliyê din jî di avabûn û sazûmaniya xebatên çapemeniyê de rolek sereke dilîze. Ji Dêrikê heta Efrînê li tevahiya erdnîgariya herêmê gav bi gav digere, pêvajoya şoreşê dişopîne û bi dehan şagirtan perwerde dike. Bi vê xebata xwe dibe yek ji stûnên şoreşa Rojava û çapemeniya şoreşê. Vê berpirsyariya xwe ya serxistina şoreşê, rol û girîngiya çapemeniyê heta kêliya dawî ya jiyana xwe jî bi serkeftî dimeşîne.

### Pêşengê çapemniya Kurdî bû

Di cîhana çapemeniya azad a gelê Kurd de li seranserî çar perçeyên Kurdistanê xebateke bêhempa da meşandin. Bi sedan rojnamevan li ser destê wî hatin perwerdekirin û pisporiya xwe bi wan re par ve kir. Şehîd Seyid Evran ne tenê di ofîsa xwe de kar dikir, lê belê wî deşt, çiya û hemû dever kir qada xwe ya xebatê. Lewma jî dîrok û rastiya gelê Kurd, lêkolîn kir, nivîsand û bi belge kir ji bo pêşveçûna hişmendiya nifşên siberojê. Ew bîr û hafizeya Çapemeniya Azad a 30 salên dawiyê bû. Li ser vê rêya bi rûmet û giranbuha bû rêwiyekî çalak ê bêwestan. Azwerî, xebata ji bo ronîkirina civakan û biryardariya wî ya têkoşînê hemû astengî û zehmetiyên derketine pêşiya wî ji holê rakirin. Bi sekin, liv û tevger û pênûsa



xwe, di rûpelên çapemeniya azad de cihekî bêhempa girtiye.

### Têkoşîna li hemberî mirinê û qezenckirina şehadetê

Seyîd Evran ji sala 2020'an ve bi pirsgirêkên tenduristiyê têkoşîn dikir. Du caran kirîza dil derbas kir, lewma neçar ma ku çend caran emeliyat bibe. Tevî pirsgirêkên xwe yên tunduristiyê jî, bênavber xebatên xwe meşandin û ji coş û kelecana xwe tiştek winda nekir. Herî dawî nexweşiya wî dijwartir bû, lewma demekê li nexweşxaneyê dihat dermankirin. Lê mixabin tevî hemû hewldanan jî, sibeha 22'ê îlonê koça dawî kir.

### Peyama dawî ya Seyîd Evran

Hevalê me yê rojnamevan Seyîd Evran beriya şehîd bikeve bi sernavê "Ber bi rêwîtiya dawî ve" peyamek dabû.
Hevalê me yê rojnamevan Seyîd Evran ku salên dûr û dirêj li ANF'ê xebitî, beriya şehîd bikeve peyamek dabû.
Peyama dawî ya Seyîd Evran bi vî rengî bû:
"Ber bi rêwîtiya dawî ve!
Ji bo wate li her kêliya jiyanê bê kirin pêwîstî bi têkoşîneke mezin heye. Min jî ji bo vê wateyê têkoşîneke mezin meşand. Ez Kurd bûm û diviya bû gelê min azad bibûya. Ji bo vê jî heta nefesa xwe ya dawî min pênûs û kameraya xwe bi kar anî û gotina xwe got. Niha bala xwe didimê, çend nifş guherîn? Ya ku pê zanim ew e ku em her roj zêde bûn... Em ji kevneşopiya wan tên ku felsefeya 'Em di gorê de jî bin em ê ji bo azadiya vî gelî wezîfeya xwe bi cih bînin' ji xwe re kirine pîvan. Lewma em hebûn û jiyan.
Kalkê min dema ku bi Şêx Seîd re meşiya ev têkoşîn da destpêkirin. Ez neviyê kalkê xwe me, ala ku min wergirtiye bi Rêber Apo û PKK'ê min dewam kir. Ji Amedê heta Xerzanê, ji Efrînê heta Qamişloyê, ji Zapê heta Silêmaniyeyê, ji Ûrmiyê het Mahabadê ez li her derê bûm. Niha aliyekî min Bakur e, aliyekî min Rojava ye, aliyekî min Başûr e, aliyekî min Rojhilat e. Ez bi temamî bûm Kurdistan. Êdî bi milyonan mirov li pey me hene û wê vê kevneşopiyê dewam bikin...
Gelek tişt hebûn ku diviyabû bihatina kirin, lê dem ewqas bû. Di nava xêr û xweşiyê de bimînin!"

### Soza şopdariya riya Enter, Ersoz, Denîz û Evranan li dar e

Wekî tê zanîn pirtûka çapemeniya azad dagirtî ye ji lehengên rojnamevan ku xebateke zêrîn kirine û xwîna xwe kirine diyarî ji bo gel û tevgera xwe. Seyîd Evran jî mîna têkoşerên çapemeniya azad yên wekî Apê Mûsa, Gûrbetellî Ersoz, Xelîl Dag, Nûjiyan Erhan, Denîz Firat, Dilîşan Îbîş, Cîhan Belgîn, Nazim Daştan û bi dehan şehîdên din di riya heqîqet û azadiyê de bû meşalek ku rêya me ronî dike. Ji şopdarên rêya ronîkirinê mîrateyek mezin hiştiye. Em jî weke şopdarên şervanên pênûsa azad soza mezinkirin û berfirehkirina vê têkoşînê û heqîqetê didin. Rêya wan wê her tim me ronî û zana bike.

---

FENER



## Seyid Evran.. Pênûsa qet naşike û romana heqîqeta bê dawî

**Idrîs Henan**

Her şehadetek şervanekî azadiyê mîrateyeke di bîra galan de hatiye kolandin û di rêwîtiya ber bi azadiyê ve nifşek radestî nifşekî din dike. Mirov wisa dikare mane bide şehadetên têkoşer û rêwiyên ber bi rastiyê ve. Seyid Evran jî yek ji pêşengên azad ê rastî û heqîqetê ye ku temsîla qonaxek girîng di pêvajoya vesazkirina Ragihandina Azad de dike. Ji ber ku rojnamevanekî lêgerîner, vekoler û şopînerê heqîqetê bû, şoreşgerekî dunyaya rastiyê bû. Baweriya wî ew bû ku; ancax jiyana azad bi yekbûna bi rastiyê re bête jiyîn. Derveyî wê jî dê xapandin û rewşeke tevizandinê be. Lew re, bi têkoşîna xwe ya temsîlkirina prensîbên çapemeniya azad ku veguhere çeka sereke ya rizgariyê, nûnertiya jiyan azad a rasteqîn dikir.
Her kesî/ê xwe rojnamevan dibîne û hewl dide li ser şopa heqîqetê romana rastiyê binivîse û ji nifşên bê re bibe mîrate, divê ji wesiyeta Seyid Evran a dawîn îlhamê bigire û rêbazên fedayetiya xwe dispêre têkoşîna watedar a meşa dîrokî ya ber bi azadiyê ve, bi dest bixe. Ji xwe Ş. Seyid Evran timî bang li hevkar û şagirtên xwe dikir: "Min jî ji bo vê wateyê têkoşîneke mezin meşand. Ez Kurd bûm û diviyabû gelê min azad bibûya. Ji bo vê jî heta nefesa xwe ya dawî min pênûs û kameraya xwe bi kar anî".
Ev gotinên mîmarê heqîqetê rêheval Seyid Evran ne tenê ji bo xwendin û bîranînê ne, lê divê her tim weke xetîreyekê ku rê ronî dike vêxistî be. Bêguman bi fîzîkî ji nav me bar kir, lê mûma ku wî vêxistiye divê her kesî/ê ku pênûs, kamera hildigire û kelecana azadiyê di dilê wî/ê de ye li ser şopa wî bimeşe, ala wî bilind bike û mûma wî vêketî bimîne.
Dilsozî û durustbûn ew e ku em pabendê xeta Seyidan bin ku bi biryardariyeke bêdawî hêzeke karibe têkoşîna wî mezintir bike û bigihîne serkeftinê ava bikin. Ango, performans û berpirsiyariyên derxistine holê ji navenda êşa barkirina wî ji nav me, zindî bikin û xeta wî a zaferê misoger dike bi wefedariyeke pir mezin dewam bikin.
Ş. Seyid Evran di peyama xwe ya dawî de rêbaza xwe ya têkoşînê vedestî me dike û dibêje: "Em ji kevneşopiya wan tên ku felsefeya 'Em di gorê de bin jî em ê ji bo azadiya vî gelî wezîfeya xwe bi cih bînin' ji xwe re kirine pîvan. Lewma em hebûn û jiyan in".
Mirov ji peyama Ş. Seyid fêm dike ku dizanîbû çi têkoşîn meşandiye û armancên xwe ewqas baş û zelal nas dikirin, ku bi merdî li ser mîrateya bapîrê xwe ê ku şoreşgerekî Şêx Seîd bû, gavên mezin bi Tevgera Azadiyê re ber bi heqîqeta neteweyî ya niştimanperwer ve avêtin. Yanê; ew bi xwe mîrateyeke berxwedanê û nifşek berhemdar ê wê têkoşînê ye. Ji lew re jî qet têkoşîn û xebata daye meşandin sînordar nekiriye û lêgerîna xwe ya li nasnameya rastî û heqîqeta gelê Kurd ya dîrokî re li çar parçeyên welat û derveyî welat dewam kiriye ku şertekî rojnamegeriya azad a lêgerîner e. Ji bona vê yekê ronî bike, di peyama xwe ya dawîn de gotiye: "Ji Amedê heta Xerzanê, ji Efrînê heta Qamişloyê, ji Zapê heta Silêmaniyeyê, ji Ûrmiyê heta Mahabadê ez li her derê bûm. Niha aliyekî min Bakur e, aliyekî min Rojava ye, aliyekî min Başûr e, aliyekî min Rojhilat e. Ez bi temamî bûm Kurdistan".
Bi vî awayî, laş dikevin, lê pênûs dimînin. Jiyanek diqede, efsaneyek dest pê dike û çîrok berdewam dike. Mûma wî tê vêxistin, ala wî tê bilindkirin û gavên wî rê nîşanî me dikin.